

ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi

NEWROZ



23
1989

NAVEROK

Jî Xwendevanan	3
Eminê EVDAL	4
Çend Çarin	7
Lî Ser Rênviseke Rast	8
Hevpeyvîn: Arsênê Reşîd Polatov	10
Du Tiyatro	12
Alfred NOBEL ki ye	13
Nisan Meha Tozê û Derewan	14
NEWROZ bî şahî hate pirozkirin	16
Jî Dîroka Kurdistanê (Jî Gernama Ewliya Çelebî)	18
Hunermend Mihemed ŞÊXO wefat kir	21
Maria Leisner: "Ew ne kamp in, girtixane ne!"	22
Bîla Helepçe neyê jî birkirin!	24
Lî ser otorîteya dê û bavên (Anton Makarenko)	26
Quncikê Zarokan	28
Jî Folklorê Me	30
Daxuyani Jî Bo Pressê	31

Sal: 10

Hejmar: 66 Nisan 1989

XWEDî : KOMKAR - Swêd
BERPIRSÎYAR : Şeroycê BOTAN
NAVNÎŞAN : Döbelnsgatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08 / 32 82 51
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska
Arbetar Föreningen
ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN
ADRESS : Döbelnsgatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08 / 32 82 51
PG : 458980 - 0

Gurcistana Sovyet

Birayên Roja Nû, roj baş!

Gelek silavên dilovani li we hemûyan ji komara Gurcistana Sovyetiyê.

Ez keçeke Kurd im ji bajarê Tîblîsê. Çend hejmarên kovara we ketin destê min û ez bi xwendina wan pir kêfxweş û serfiraz bûm. Min û hevalên din bi saya mîqalên we yê hêja agahdariya baş derheqa çand, dirok, zîman edebiyata me Kurda da stand.

Ez bi xwe bi pirsên zanista Kurdolojiyê va mijûl dibim, di Muzeya Hogirtiya Miletan da kardikim û ji bo vê yekê ji kovara we pirtûkên weşanxana we pir ji min ra pêwîst e, lê ez ê ji ji we ra ji vir pirtûkên nû yê ser Kurda bîşînim.

Di xweşiyê da bîminin û hêvidar im ku hûn ji min ra her car kovara xwe bîşînin.

Her bijî ronahiya Kurdan, her bijî Kurd û Kurdistan!

*Bi silavên germin
Xwişka we — Marina EZİZ*

Not: Ez dîxwazim serxweşiyê bîdîm hemû Kurdê cihanê ji bo qirkirina mîletê me yî bê sûc bi çekê kimyayî di Kurdistanê Iraqê da.

Ev zarê zarok, jin û kal-pîrê Kurdistanê li erdê nemine!..

Jî Redaksiyona Kovara Roja Nû ra.

Hevalên hêja! Ez xorteki Kurdên Sovêtîstanê, niha li zanîngeha Leningradê dîxwinim, li Fakûltêta Rohilatziyê. Ez car - cara kovara we bal hevalê xwe ê Kurdê Kurdistanê dîxwinim. Lê ez gelek hêvidar im, weki hûn kovara Roja Nû tim û tim ji min ra bîşînin. Li vir em, Kurdê Sovêtîstanê ne derheqa halê Kurdistanê serdemê nû dîzanin, ne ji edebiyata Kurdê Kurdistanê baş dîzanin. Bi h'eyf, rojname " Riya Teze" kê mî derheqa vê yekê dînwîse.

Kovara we ji bo min û hevalê mine Kurd wek dilopek sar ji kaniya Kurdistanê ye.

Bijî Kurdistan!

*Bi silavê dil
Zorabê E'slan BÛTKÎ
Leningrad*

Gurcistana Sovyet

Hevalên hêja!

Cejna we Newroz, bîmbarck- pîroz be. Bira agirê Newrozê ser mîletê me da bîmilmulc, azadî û serfiraziyê pêra bînc. Karên we yê pêwîst û grîng da pêşketinên berk dîxwazim bo Kurd û Kurdistanê.

*Keçên Kurda
GULÊ, NAZÊ, LEYLÊ*

BANGA BIRATI

Kurdino

Destên xwe dirêjkin hev

Bi hev ra bîbin yar

*Li ser erdê bav û kalan rakin xwinxwaran
Bîşkênîng ling û çekên dijminên neyar.*

Bi hev ra têkevin têkoşinan,

Bi hev ra bîkin hevkarî

Saz bîkin Kurdistanek aza û serbîxwe

Nemîne kedxwari

Welat şên û geş bîkin hûn

Êdî li ser gel rabi

Ev zulmat û tari.

Biraki wê ê dilşîm im, bangê we dîkim

Û usa dîbêm, dîwê usa be

Hêzên xwe bîkin yek,

Bi hev ra bîbin yek can, hezkiriyên hev

Ku Kurdistan rîzgar be

Silavên birati li we hemû

Birayê min ên Kurd, kurdperwer ra

NEWROZ'a we pîroz be.

*Rîza Çolpan
Awustralya*

PÎROZKIRIN

Va iro sersala me

Herin destê dayika xwe

Pîroz bîkin bav û dê

Bira maçkin çavê we

Bankin pir hogirên xwe

Agir dadin li nav xwe

Dîne bîkin kesk û sor

Pîroz bîkin sersala xwe

Def û zîrnê lêxinin

Govendeki bi hevxinin

Keç û xort dilan bigrin

Tev roja xwe pîrozkin

Sersala me roja sor

Em ji bîbin hêz û dor

Kurd pîrozkin Kurdistan

Ala rengin hildin jor

Roja Feqir li cem dilan

Bîdin hev dest û milan

Dîne tevda bîbisin lo

Pîroz dîkin Kurdistan

Feqir AHMED

1.1.1988



Şair û Zanayeki Kurd

EMİNÊ EVDAL (*)

Hêna şerê hemdinyayê pêşin, pareke Kurde Romê tevi cimeta Ermeniyayê bira ji ber şûrê eskerê Romê revî û xwe da ber bextê cimeta ûris. Ji wê rojê şunda bona van herdu cimetê zêrandi riya pêşdaçûyînê û emrê teze vebû. Emrê teze vebû usa ji bona wan tîfala, yê ku pêxwas û tazi, ti û birçî berê xwe dane Kavkazê û gelek ji wan bûne wekilê intelijensiya cimeta xwe ya hêja. Yek ji wan tîfala Eminê Evdal bû, yek ji diya xwe sala 1906, gundê Emençayirê, ser nahiya Digorê, qeza Qersê (Türkiya).

Emirjiyina Eminê Evdal û şuxulkirina wi ew nimûneke pêşdaçûyîna cimeta berê zêryayî, lê niha aza û bextewar e. Ew emirjiyina tîfaleki êtim e, yêk hêna qeydê-qanûnê sovêtiyê da ghişte dereca here bilind, bû xizmetkarê kultura cimeta xwe, bû şayir, pedagog, bû ulmdar - Kurdzan.

Sala 1919'a Eminê Evdal fakulteta pala ya bajarê Tibilisiyê da tê qebûlkirînê û wan sala dibe nasê Hakob Gazaryan (Lazo), yêk bona zarê kurmanca mektebek vekirî bû, bî herfê

ermeni elifba kurdi saz kirî bû "Şems" û zaro hini xwendinê dîkir.

Ji sala 1926'a Eminê Evdal hat Ermenistanê û li nehîya Aparanê, gundê kurmanca da dest bî xebata pedagojiyê kir. Eminê bist salî bû dersdarê zaroyê kurmanca. Ewî riya gele zaroyê nexwendî rast kir, ew hini xwendinê û emirjiyina teze kirin.

Sala 1931 Eminê Evdal hat Universiteta Êrêvanê, fakulteta filolojiyê da xwend û xwendina xwe ya bilind dest ani. Salêd 1930'i ewî Teknikûma Pîşkavkazê yê pedagojiyê da ders dîda û gazeta (rojname) "Riya Teze" da ji çawa katibê cabdar dîxebitî.

Qeyde-qanûnê sovêtiyê li Ermenistanê da mecaleke baş, mecaleke fireh bona Eminê Evdal, bona pêşdaçûyîna wi çawa ulmdar û şayir rê vekir. Salêd siyî Eminê Evdal tevi koma ulmdar bû, tevi ekspêdisiya folklorista bû û dest bî berevkirina zargotina cimeta xwe kir.

Eminê Evdal xên ji xebatê ulmî dereca zîman, erf û edetê cimeta kurda da, yêk bî zîmanê ûrisî, ermeni û kurdi neşir bûne, gele ef-

randmên bedewtiyê ji nivisin. Salê derbazbûyi da ewana bî berevokê başqe başqe (cîhê cîhê) da û antolojiyê niviskarê kurdê sovêtiyê da neşir bûne.

Efrandîna pêşîn Eminê Evdal sala 1924'a nivisi. Ew serhatiya "Casım û Tosın" bû. Ew serhatiya gele gele êtimê nona (weki) wi bû, yêd ji zeliliyê û mîrîna xilas bûn, dest bî xwendîna kîrîn, dest bî emrê teze kîrîn. (**)
Paşwextiyê çend berevokê Eminê Evdal yê bedewtiyê ji neşir bûn, yêk bûn nîmûnêd edebiyeta kurdê Sovêtiyê yê pêşîn.

Eminê Evdal çawa himdarek ji himdare edebiyeta kurdê Sovêtiyê efrandîna xwe da nişan dide, emrê cîmeta kurda roja me da: hêna dewrana Sovêtiyê da. Tema dostiyê û biratiya cîmeta ew ji temeke himli bû bona efrandîna şayir. Rex efrandîna lirikiyê Eminê Ev-

dal nivisin şîer û poemên usa, yêk derheqa wetenhuziya merivê Sovêtiyê da, xebata wi ya herroji da gili dikîrîn.

Eminê Evdal wefat bû 22'yê Îlonê sala 1964'a li bajarê Êrêvanê. Ew wefa bû wi çaxi, çaxê qeweta wi yê efrandariyê dereca ulm û edebiyetê da gihîştî bû hêlanêd bilind.

CASIMÊ CELİL

(*) *Ev bendê Casimê Celil, di "Berevok" a Eminê Evdal da (sala 1977 li Êrêvanê çap bûye) wek pêşgotin hatiye nîvisandin. Çend şîerên Eminê Evdal ku em neşir dikin, ew ji ji wê berevokê hatine stendin.*

(**) *"Casım û Tosın" di sala 1978, li Tirkîyê, kovara Özgürlük Yolu da (hejmar 43), tevî Tirkîya wê hat neşir kîrîn.*

Çend Şîerên Eminê Evdal

LAWKÊ DELAL

*Xwezil bî te, lawkê delal,
Muhba te pîr, fikre zelal,
Kêfa te ci ye, dengê te ziz,
Kurê temiz, şîrinê eziz.*

*Te ne ditye rojêd melûl,
Tu ne bûyi dîz, ne bûyi qûl
Selam hema vê riya te ra,
Şabûn got emrê me ra.*

1936 - Êrêvan

PIONÊRAN

*Timê cêrge dîçe pêşda,
Hergav xweş e bangzê wana,
Yek, du, yek.*

*Beyraqê wana dîmilîmîlîn,
Defê wana ringeringîn,
Yek, du, yek.*

*Ew cahilê meyê jir in,
Ewledê me pîr twidir in,
Yek, du, yek.*

*Welathiz in pionêran,
Dilê me dikin eşq û şa,
Yek, du, yek.*

*Bî dil û ceger yek in,
Ewana bî hev gi şîrin in,
Yek, du, yek.*

1946

ZEVİYA ME

*Qesel qerqaş, hinek şîin e,
Çiqas rind e zeviya me,
Hebîn li te me avitye,
Kare bîde, zeviya me.*

*Sîmlê we gir, hebe tiji,
We pêl daye ser hevdu,
Ba lêdixê, tu pêl didi,
Disa vedgeri ser xwe.*

*Em hiviye ne, em dixwazîn
Em muhbeta kara te,
Bangzê te ra em dikenîn,
Te şa kîriye dilê me.*

*Gurza didin ser hevdu
Dîqerime milê me,
Rîzqê me gîşka yi tu,
Tu kanike kolxoza me.*

1934—Êrêvan

OKTİYABRÊ RA

*Te azayi ani me ra,
Em şakîrîn ruh û can va,
Gelek ciya te perveda,
Şabûn ani me gîşka ra.*

*Fire bûyi, keti dîla,
Keti bajar, gund û şêna,
Şa kîr dilê qîz û xorta,
Dilê hemûya -kal û pîra.*

*Hersal têyi şabûn te ra,
Şewqê didi tu dîla:
Xebatçiyê dinyayê gîşka,
Selam timê navê te ra.*

Çawa timê, iro ji em usa,
Bilind dîkîn sor beyraqa,
Em kılama te dibêjin,
Eşqa dîla tev dirêjin.

Dinêke teze çêkir te,
Ça ronaydar, azadar,
Pê beyraqa te altindar
Pêşda dîçin emê dîlbar.

Em cimet gı twayi,
Bı huzkırın -dilê şayi,
Bı te distrên, -timê wê bistrên
Heta heya merwayi.

LI ELEGEZÊ

Rûniştım nav kulilka: devê rê,
Rex maleke gundê Elegezê.
Bina kulilkê erd hildaye,
Dilê mın gelek gelek şa ye.

Ezmani hêşin e, tamam sa ye,
Berfa serê çiya per vedaye,
Xule-xula avêd kaniya ye.
Dilê mın bîhara gula ye.

Î gundê Elegezê rex mın,
Radyo distrê deng tê bilind,
Dengê saz tê ji Êrêvanê,
Kılama dîwên: "Leylê Xanê".

Dinîhêrım deştê û zeviya,
Seri dane ser hev sımıla,
Pêl dîdın, vedgerın, disa,
Dibêji, ew ji distrên niha.

Çiyayê Elegezê dinîhêrım,
Ji zeviyê mîlmîli, çayir - çimana,
Bı eşq û gul tujî ye dilê mın,
Xweş e Elegez çıqa - çıqa.

1948

1949

NISAN MEHA.. (Destpêk rûp: 14)

— Beg efendi...

— Eva rasti ye, ku êdi herkes pê dîzane,
hetta dergevan û lawikê qehwefiroş ji. Ez ne
waiz im ne ji parêzvanê te me. Tu bı dilê xwe
yi, çı ji jiyana xwe diki işê te ye. Lê heqê mın
heye ez ji te bixwazım weki tu dev ji van dini-
tiyan berdi, dı wextê iş da.

— Beg efendi...

— Çı Beg efendi, Beg efendi! Qenciyeke pi-
çûk li mın bike, dev ji van dinitiyên xwe berde
dı wextê iş da.

— Xuda dîzane ez nexweş im!

— Jı xwe tu tim û tim nexweşi.

— Hûn bawer nakın...

— Jı ber nexweşiyê wisa ye, ne tîşteki dın.

— Tîştê ku dı çavên te da dibinım, sorbûn,
west û graniyê dibinım.

— Guh mede gotmên xelkê...

— Çavên te berevaji dinîhêrın, ne li bere-
pêş wek hemû mexlûqatên Xwedê yên mayın.
Xwe nevêje binê wê çala bêdawi. Tu niha çıl
sali yi, salên çili salên hiş û kemaletê ne! Dev
ji van bêhişiyar berde!

Şef, destên xwe yên bı pırça sipi rakır û
bala wi kışand.

— Ez tenê miasê te yê du rojan dibırım, lê
hay ji xwe hebe, careke dın tîşteki weha neke,
wi got û Anis vejeriya ku here.

— Tu dê kingê दौरا dewletê û holika dûxa-
nê ji hev cuda biki, wi ev gotmên dawiyê lê
zêde kır çaxa Anis berbı deri dıçû.

Çaxa vejeriya cihê xwe gışkan serê xwe
ziwandibûn, bı meraq li wi dinîhêrın. Wi qet
guh neda wan, çû li ber masa xwe rûnişt, qeh-
we li ser masê li benda wi bû. Wi dı bin çavan
ra dit ku hevaleki iş pêşda hat ku tîşteki jê bı-
pırse, lê wi qet li xwe daneyni.

— Here işê xwe, te iş bı mın nine...

Wi murekebdank derxist ku pê nûsa xwe
dagre. Neçar bû ku hemû wê raporê ji nû va
çêke.

"Pêşketina hatınan... Çı pêşketın e, çı hal
e! Tenê yek pêşketın heye, ew ji em dızvırın û
disa têne ser sıfırê. Ū dı vê xebatê da hemû
tîştên hêja wında dıbin, tehsila tîpê, a huqû-
qê, ew xısım û pısmamên ku mirov li gundê
xwe yê berê û xweş hiştme û ji mêj da ew ji
bir kırine, jin û keç niha dı bin axê da... Ū ew
gotmên xweş ku wextekê bı agrê şewq û
dılxeşiyê vediketın, iro dı binê cemedeke stûr
da veşarti ne. Rê vala û bêdeng in. Deri û pen-
cere tên girtın. Jı ber piyê hespan toz dûman
radibe. Memlûki* dema nişangirtina tiravêtinê
da ji şabûnê dıqırın. Ki bikeve ber wan li Mar-
gûş û Gamelayê**, dibe armanç ji bo tirên
wan. Xelk li hember qêrin û şahiya wan bê-
deng dibe. Jinika ku du lawên xwe qurban da-
ye, ji wan tika dike: "Merhemet bıkın geli
memlûkiyan." Lê merhemeta nê çirvanan tu-
ne. Ew vi tîştı dıkin, tenê ji bo wextborinê û
kêfê."

Qehwa li ber wi sar bûbû û tama wê xera
bûbû, wextê ku memlûki tiq-tiq dikeniyar. Pa-
şê ew fantazi bûn serêş û memlûki ji her dike-
niyan. Wan rû berdıdan û toz û dûman li pey
xwe radıkırın. Pozbılandı û êşkencekırın her-
tım kêfxweşi bû ji bo wana.

Lê niha xebateke bı kêf destpê kır dı vê
oda tari da, vê yekê dıda xuyan ku roja xeba-
tê êdi qediyabû.

* Memlûki Tırk in, ku wek kole çüne Mısırê û
paşê li wir emiretek ava kırine. Dı Tırkiya nû da ji
wan ra "kölemenler" tê gotın (w).

** Du taxên Qahirê.

çend çarin

BARAN

Mırın jı êzmin hat, wek ba û baran, xem û xeyal
Lı Helepçê bıhar bû, çılmısın gul û zarokên delal
Hışk û hol bû dıl, cemıdı av û çav, sekını zeman
Weşın teyr û tûr, pel û insan, lı erdê bûn xezal

* * *

Bı kılama azadi mezın bûm, wek şına êzmin, ava kaniyan
Lı benda wekhevi, lı benda nan û xwê, wek berfa ser çıyan
Mıja zer ser me da gırt, kılama me bıri, nivçe hışt
Em zarokên berşır, xort û heyştê sali, pênc hezar can

* * *

Mırı têr in, natırsın, naêşın, wek hev in mırı
Bêderd û bêheq, ne nan dıxwazın, ne azadi
Mırı wek Kurd in, pırsa wan serê kesi naêşine
Ne lı Waşington, ne lı Cenevr û Helsinki

* * *

Dinê usa ye, ger xurt i, xudı gotın û heq i
Ger jar i, bındest û perişan û neheq i
Gıregırên vê dinê û wê dinê pır tışt dibên
Lê dı riya aşiti û başıtiyê da sebra me teqi

* * *

Dı riya azadiyê da hezaran hatın, hezaran çûn
Ka roja me? Ewqas sal û zeman hatın çûn
Hêvidar be hevalo, dı avê da naçe xuh û xwin
Gel man, lê gele Sezar û Hulagû Han hatın çûn

LI SER ,, RÊNIVISEKE RAST Û YEKGIRTÎ ,,

Lî gor ditîna me pîrsa "Rêniviseke rast û yekgirtî" pîrseke gîring e. Kovara BERBANG'ê lî ser vê pîrsê ditmên redaksiyona ROJA NÛ pîrsî û me jî raya xwe got. Jî bo xwendevanên ku Berbang nakeve destê wan, em vê hevpeyvînê lî vir jî diweşînin.

Redaksiyona Roja Nû

■ 1— Dî hejmara 3/88 a BERBANG'Ê de lî ser navê redaksiyonê, bî navê "Ber bî rêniviseke rast û yekgirtî" me quncîkek vekir. Wek redaksiyona rojnameke Kurdi nêrina we lî ser vê quncîkê çî ye? We jî bo Roja Nû hun qanûnên rênivîsê tesbît kirîne an na?

■ 2— Ditîna we ya lî ser wan 11 bendên ku me tesbît kirîne çî ye, gelo hun dîkarîna lî ser wan bendan yek bî yek ditmên xwe bîbêjin.

■ 3— Eger hun hînek bendan rast dibînin, gelo hun amade ne lî gor wan binivîsin.

■ 4— Pîraniya Rojname û kovarên kurdi herfên "î" û "î" yê bî awayê ku me lî vir nivîsi (î, î) dinivîsin. Lê belê Roja Nû bî awayê "î" û "î" dinivîse. Em dixwazîna hun lî ser sedemên vê cîdahiyê jî bo xwendevanên Berbangê bîpeyîwin.

Em jî nuha de jî bo berswên we spas dikin.

BERBANG

1- Tîştêki xuya ye ku, herçî kesê ku dipeyve û dinivîse gora qeydeyên peyivandîna û nivîsandîna (qeydeyên rêzîman) vî karî bî pêk tîne. Lê helbet qeydeyên nivîsandîna me bî xwe çê yan jî "tesbît" ne kirîye, ew berî me hebûn.

Wekî jî we ra jî eyan e, dî nivîsandîna Kurdi da bî tipên Latîni du xetên esasi çêbûn. Bîngêhê herduwan jî dî salên 1920'î û 1930'î da, ango 50 - 60 sal berê hatîne danîn. Yek ya Kurdên Sovyet e, yek jî ya Celadet Bedîrxan e, yan jî ya Hawarê ye.

Me Kurdên Kurdîstana Tûrkiyê, bî şîkleki esasi, gramera Celadet Bedîrxan, ango ya Hawarê daye pêş xwe û gora wê dinivîsin. Ya kovara me jî ev e.

Lê ger meriv hûr lê binêre tê xuyan ku dî Roja Nû da jî hun tîşt ne lî gor qeydeyên gramera Bedîrxan tîne nivîsandîna. Ango ferq hene û meriv dikare bêje ku kêmasî jî hene.

Yek ev e ku, tesîra nivîsandîna Kurdên Sovyet lî ser Kurdên Tûrkiyê çê dibe. Ya dinê jî, gelek kes bala xwe baş nadîne qeydeyên zîman, ango gramera Celadet baş nizanîna. Dî aliyê çand û zîman da jî, jî bo Kurdan serokatîyek, yan jî otorîteyek, tune ku rê rast bike û herkes gora wê bike (Bo Kurdên Sovyet ev otorîte heye, ew sazgeyên dewletê ne û herkes jî gora wan dike; bo vê yekê jî dî nav Kurdên Sovyet da ev pîrs û problem nemaye). Xuya ye ku ev pîrsa zîman û çand bî pîrsa azadîyê ra bî xurtî girêdayî ye.

Lê heya wê wextê divê em çî bîkîna?

Nuha du rê lî pêş me hene: Divê em jî van du rêzîmanan yekî bîdîne pêş xwe. Me Kurdên Tûrkiyê ya Celadet daye pêş xwe em gelek rê jî hatîne. Bo yekîtîya zîman divê em gor vê rêzîmanê bîkîna, qeydeyên wê baş hin bin û bî kar binîna. Hîngê dî zîmanê nivîsandîna da yekîtî çê dibe.

Wîsa nebe û herkes, her nivîskar û her rojname-kovar lî gor xwe bîguhure, qeydeyan derxe, hîngê rêzîman tevlihev dibe. "Rêniviseke rast û yekgirtî" bî vî awayî çê nabe. Bî raya me ev xetereke mezîna e ku divê em xwe jê bîparêzîna.

Em hemû jî dîzanîna ku Celadet zana û pîsporekî hêja bû dî aliyê zîmanzaniyê da. Wî bîngêhê zîmanê me yê nivîsandîna daniye. Dî Hawarê da, wî û hevalên xwe, bî zîma-

neki zelal û xweş ew bî kar anîne û jî me ra xezneyeke mezîna hîştîne. Divê em jî vê xeznê hin bin û wê bî kar binîna.

Baş bala xwe bîdîne efrandinên wan hosteyan. Jî aliyê nivîsandîna rast û delal, pîştî 50 - 60 sal jî, em ne lî pêş wan in, eger gelekî lî paş wan nebîna.

Lê meriv dikare bêje ku kêmasiyên rêzîmana Celadet tune, yan jî dî rêzîmanan da tûcar guhartîna çê nabîna? Helbet dibe ku kêmasî jî hebîna û ku wext derbas dibe ew kêmasî xwe nişan didîna û divê hin tîşt bîna guhartîna. Lê jî vê yekê ra jî disa otorîte divê. Herkes bî serê xwe bike zîman tevlihev dibe.

Dibe ku - û heye jî- hun tîşt lî me jî xweş nayên. Lê divê em sebir bîkîna. Eger jî destê me tê, îro em otorîteyek wîsa pêk binîna. Lê xuyaye ku îro ev zehmet e. Hîngê divê em lez nekîna û rêzîmana heyî jî xera nekîna.

2. û 3. lî gor bersîva me ya jorîna, ne hewceye ku em lî ser pêşniyarên we yek bî yek bîsekînin. Tîştê ku hûn pêşniyar dikîna, eger lî gor rêzîmana Celadet be, em pêra ne.

4- Wek rêzîman, em lî dijîna ku dî elfabeya Celadet da guhartîna çêbe.. Pîrsa (î - î) û (î - î) îstîsnayek e.

Ew guhartîna jî berî me hatîbû çêkirîna, me dî ci da ditîna lî gor wê kirîna.

Gelek kes pê dîzanîna, ev guhartîna berê, dî salên 1960 da bî destê Şîvan (Sait Kîrmîzîtoprak) hatîbû çêkirîna. Bona ku xwendîna û nivîsandîna hêsan bibe bo Kurdên Tûrkiyê. Jî ber ku Kurdên Tûrkiyê hîni elfabeya Tûrki bûne. Dî

Tûrki da hîmberê van dengîna hene. Eger lî gor wan bîna nivîsandîna jî bo xwendîna û nivîsandîna hêsan dibe.

Ev guhartîna dî karên çapemenî da cara pêşîna kovara Özgürlük Yolu (Riya Azadî) da xwe nişan da. Pîstre Roja Welat jî ev guhartîna bî kar anîna.

Bî raya me, vî guhartîna biçûk hêsanîyekê mezîna pêk anîna jî bo Kurdên Tûrkiyê. Jî xwe Kurdên ku elfabeya Latîni bî kar tînin, Kurdên Tûrkiyê ne (heya derecekî jî Kurdên Sûriyê).

Bî hezaran insanên me lî Kurdîstana Tûrkiyê, dî saya Özgürlük Yolu û Roja Welat da xwendîna û nivîsandîna Kurdi bî vî awayê hin binîna. Jî hêsanî pêve, çî zîrara gelê

me di vê yekê da heye?

Em bêne pîrsa "pîraniyê".

Roja Nû tevi hejmarên berê (ku him bi Tirkî û him ji bi Kurdî derdiket û demekê di çend hejmaran da şeweya (i - î) bi kar ani, piştê em bêtir ghiştin wê bir û baweriyê ku şeweya me ya iroyin rasttir û hêsantir e) gîha hejmarê 64 an. Riya Azadî gîha hejmarê 121, Dengê Komkar gîha 110 (herdu ji qismek bi Kurdî ne). Ew ji vê guhartinê di ci da dibinin. We bi xwe ji, angê Berbangê, berê wek me dinivisand. Jina Nû ji wisa bû. Angê kovarên ku di van deh salên dawin da li Ewropayê derdiketin, pîrani (i) û (i) wek me dinivisandin. Piştê Berbangê û Armancê ev yek guhartin û bi raya me baş nekirin.

Lê pîrsa "pîraniyê" tiştêki dîn e, tiştê giring kujan rast e, yan di ci da ye, ev e.

Li ser vê yekê heta nuha munaqêşe, qasî ku em pê dizanin, -bêtir di suhbet û gotûbêjan da- bi vî rengî tîn xuyakirin:

1) Divê mirov elfabeya Hawarê neguhurine, otorita Celadet Bedîrxan qebûl bike.

2) Herfa (i) Tirkî ye, (î) Kurdî ye. C. Bedîrxan wisa nivisiye ku ji Tirkî cuda (dûr) be.

3) Di Kurdî da dengê (i) dirêj e, divê bi tipa (î) bête nivisandin.

Bi raya me, ev guhartina biçûk -ku berî me çê bûye û geleki ji ciyê xwe girtiye- ne dîrketin e ji elfabeya C. Bedîrxan. Ji ber ku:

1- Dema C. Bedîrxan bingehê elfabeya Kurdî daniye, li ser şeş (6) esasan sekiniye. Yek ji wan ji ew e ku elfabeya Kurdî nêzîki ya Tirkî be. Him ji destûra yekemîn e... Di Hawarê da (hejmar 2, rûpel 6) weha dibêje:

Me ev bingehên ha di dora şeş destûran de gihandine hev.

I- Ji wan niqtan pêve ko xasê dengên nîya zmanê kurdî ne, di şikl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabeya tirkan nîzing xistin û jê ne dîrketin. Armanca elfabê sekinandina dengên li ser kaxezê bi şiklan e, şikl bi herfan tîn nîşan kirin, û herf qebalewî û bihemdin. Ji lewre nîşankirina dengê (T) bi (c) û yê (Ç) bi (ç) û bi hevguhartin û cihguhastina wan wekhev û bêferq e.

Lê bi vî awayî kurdên welatê jorîn û heçî ko elfabeya tirkî dinasin dê bikarin bê dişwarî ya kurdî hîn bibin û komel û kitêbên me bihêsantir bixwînin.

Kesên ku dibêjin C. Bedîrxan xwestiye ku elfabeya Kurdî û Tirkî ji hev dûr bin bila çend caran ser hev destûra yekemîn (I.) bixwînin. Hingê em bawer dikin wê raya xwe biguhurinin. Eger ev ji tîr neke bila di Hawarê da (hejmar 2, rûpel 7) rêzên jêrin bixwînin:

Tinê di elfabeya tirkî de (q) û (w) nînin, Ji ber ko di zmanê tirkî de dengên cihê wek (v) û (w); (k) û (q) nayin dîtin. Dengê herfa (w) ji xwe di tirkîyê de peyda nabit.

Û di destûra duwemîn (II.) da ji weha dibêje:

II- Herçend dibe, ewçend dengên herfên latînî ên adeti ko di zmanên din de nas in, di elfabeya kurdî de hilanîn û neguhartin. Bi vî awayî kurdê bikarin elfabeya biyanîyan û biyanî ya me bi hêsantir fêr bibin.

Li vî ji diyar dibe ku C. Bedîrxan ne tenê nêzîkbûna elfabeya Kurdî û Tirkî xwestiye, herweha hewl daye ku herfên Latîni ên adeti ku di zmanên din da nas in, di Kurdî da wek xwe bininin.

2- Gelo çima nişana (i) ku di zmanên din da (i) ye, di Kurdî da bûye (î) û ji bo dengê (i) ji nişana (î) hatiye pejirandin? (!)

Çawa ku him kes dibêjin, gelo (i) yê Kurdî dirêj e? Ma qey ji (i) yê kurt ra ji herfek heye? Na. Ji kurtayî - dirêjayî dengê ra herfên cuda nayên tayinkirin. Ev ne sedem e û ew bi xwe ji di destûra çaran (IV.) an da weha dibêje:

"... Ji ber ku elfabê tînê dengên nişan dîke, ne rengê dengên"

Angê kurtayî û dirêjayî, teql û şidandina her dengêki bi herfeke cuda nayê diyarkirin...

Li gor ditîna me, madem nêzîkbûna elfabeyên Latîni xwestiye, diwiyabû ku (i) wek xwe bihiştin û ji dengê (î) ra herfek kîş bikira. Mesela wek Tirkî bûya, hingê wê nişanek ji kêm bibûya. Di dawîya destûra şeşan (VI.) an da weha dibêje:

"... Ji xwe boş bûna nişanan nivisandinê kurêt dîke." (Boş: Tiji, pîr. RN)

Em wisa texmîn dikin ku tunebûna imkânên wi yê teknîki bûye sedemê vê zêdahiyê. Angê kumîkê li ser (î) yê. Dema Hawar di sala 1932 an da li Şamê dest bi weşanê kûriye û hingê bi daktîloya Fransî hatiye nivisandin û dibe ku di makinê da tunebûna tipa (î) (wek ya Tirkî), bûye sedemê biryareke weha... Ev ihtimaleke xurt e. Gengaziyên teknîki iro ji gelek caran dibe sedemê guhartina nişanan. Wek nimûne, pirtûkên ku li Sovyetê, bi tipên Latîni derketine nişaneke nû (!) danine ji bo dengê (i). Em li jêrê nimûneyeki bidin:

Çûme Cizîrê lê, lê, lê, lê, lê,
Lê, lê, lê, lê, lê, lê, Cizîr wî alî,
Hatime Cizîrê lê, lê, lê, lê,
Lê, lê, lê, Cizîr vî alî,


Eger mina texmîna me ya jorîn nebe ji, li gor ditîna me nivisandinê (i) yê bi kumîk (î) girêdayî tu sedemêki zanîstî nîne û pratîk ji nîne.

Bi taybetî ji bo zarokan dijwariyeke bilesebeb e.

Ma çima emê zorê bidine zarokan ku dibistanê "dibistan" bixwînin...

Eger him kes dixwazin illa wisa binivîsin, çima ku di Hawarê da carekî wisa hatiye danîn, bila ji bir nekîn ku Hawarê bi xwe ji di wextê da, di elfabeya xwe da guhartin çêkûriye. Mesela hetanî hejmarê 3 an tipên (Q) û (K) di şûna hev da hatine nivisandin. Paşê temsîla dengê iro kûrîne. Nimûneyeke biçûk:

"Qomela Qurdi" paşê bûye "Kovara Kurdî"...



Arsênê Reşit tevi nîwîskarê bî nav û deng Wilyam Saroyan.

Arsênê

Reşit

Polatov:

Pantomima ewqasi
nêziki dîlê mîn e ku,
mîn navê dota xwe
daniye BÊZAR

Van dawîya lî komara Almanya Federal û bajarê Berlina Rojava festivala (mehreçan) pandomimayê (şanoya bê deng, bê zar) ya navnetewî hat çekirin. Ji gelek welatên cihanê hunermend beşdari festivalê bûn. Ji her welateki zanyareki bî nav û deng tekli fi wira kiribûn wek endamê juriyê. Ji Yekitiya Sovyet rejisorê sereke yê tiyatroya Yêrêvanê ya pandomimayê Arsênê Reşid Polatov hêjayî vê hurmetê bûbû.

Xebatkarê rojnama "Riya Teze" Têmûrê Xelil Mûradov rasti rejisor Arsênê Reşid Polatov hat û jê hivi kir ku bersiva çend pirsan bide.

T.X: Kerema xwe hûn dîkarin bir û baweriyên xwe yê nî ser festivalê jî xwendevanên me ra bêjin?

A.R.P: Dî nava vi cûrê hunermendiya bêdeng da çend janr (babet, şêwe) hene. Nêta (mebest) juriyê a sereke ew bû, ku cudabûna van janra bî awaki zelal bide kifşê û dî vi wari da kîl û kêmasiyên tiyatroyên cihanê bî qîmetke (bîhêjine); xebata wan rasterê bike. Goti (divê) bîghijine wê yekê, weki gerek wan piyesa nekî şano bona tiyatroyên pandomimayê yê nî ku dî tiyatroyên sade da dîkarin dîha rînd (rîndtir) bêne qebûlkirin.

T.X: Hûn hesab dîbin wek zanayeki hunera pandomimayê ê herî bî nav û deng lî Yekitiya Sovyet û lî cihanê jî.. Çawa û bî saya çî hûn gîhiştine wê hurmetê û wê derecê?

A.R.P: Gava mîn dî fakultêta Zanîngeha Leningradê ya filozofiyê qursa pêşin da dixwend, pandomimisteki cihaneyî navdar Marsêl Marsoê jî Fransayê, yê ku wek "bavê" pandomimayê tê hesabkirin, hatibû Leningradê. Ji mîn ra lî hev hat ku listîka wi bîbinim û wek dibêjin, rîya jiyana xwe bîbijêrim. Mîn xwendina xwe ya lî Leningradê hişt, çûme Moskovayê dî qursên artistên pandomimayê a du salî da hatim qebûlkirin. Pîştî ku mîn ev qurs kuta kir, ez lî fakultêta instituta Moskovayê ya kulturê, beşê rejisoriyê hatim qebûlkirin. Bî xwendinê ra tevayî mîn çend kadro amade kirim bona tiyatroya Moskovayê ya pandomimayê, ku wê çaxê ya yekane (tek, tenê) bû lî temamiya Sovyetistanê.

Carekê jî, gava mîn êdî xwendina xwe temam dikir, Wezirê Çandî yê Komara Ermenis-

tanê hate ba mın û pırsi: "Tu çı milleti û ji kêderê ye?" Mın got ku, ez Kurd im û ji gundê kurdayi Tılık im, lı Ermenistanê. Ewi pêşniyaz kır, ku ez bême Yêrêvanê û tiyatroya pandomimayê saz bikım. Mın ji tışteki wisa dixwest. Ez qayil bım.

T.X: Hûn çı dıkarın bêjın derheqa diroka pêşdaçûyina tiyatroya ku hûn serokatiyê lê dıkın? Derheqa destanin û kêmasiyên wê da?

A.R.P: Dı welêt da, tiyatroya pandomimayê a duwemin lı Yêrêvanê hate vekırın. Wek mın got, ez hatım pêşniyazkırın û ji sala 1972' a hetani niha ez bingevan û rejisorê wê yê se-reke me. Hetani niha me 8 şano nişan dane. Her 8 ji mın danine. Wek yên Wilyam Saroyan "Ryo - ryo, kê lı wir e?" û "yên birçi", ya Gogol "Şinêl". Jı wana sisê, -"Mniatyûr", "Yên kor", "Payiz" - yên mın bı xwe ne. Me ew lı hemû komarên Sovyetistanê nişan dane û em çûne gelek welatên dereke ji; tevi festivala navnetewi a lı Moskovayê (sala 1985'a) bûne.

Derheqa profesionalizma tiyatroya me da, jêhatın û zirekiya hunermendên me da, gelek caran kovar û rojnamê cihanê bı pesındari nıvisine.

Problemeke me ya bingehin pırsa kadroyan e. Em hetani niha bı xwe ji xwe ra kadroyan peyda dıkın û wan digihinın, amade dıkın.


T.X: Bılı xebata xwe ya bingehin hûn êdi bı çı va mijûl dıbin?

A.R.P: Niha ez pirtûkekê dınvısım bı sernıvisara "Pandomima lı Ermenistanê". Dı wê da wê malûmatiyên heweskar hebın, lı ser sazkrın, pêşketın, problem û xebatên vi cürê hunermendiya tiyatroyi lı komara me. Dı wê da herweha wê beşek ji hebe bı sernıvisara "Pandomima dı nav deba kurdan da"* . Dı vê beşê da, derheqa bükitiya bûka malê, qaziyê (kosegeldi) ku dı dewata da henek-laqırđiya dıke, dı şahıyan da nukte û pêkeninan bı qıse, mimik, bı reng û rûyê xwe nişan dıde û guhdaran dıde kenandın, wê cih bigre.

Gava gli hate ortê, ez dixwazım bıdime kışê, weki pandomima ewqasi nêziki dilê mın e, ku mın navê dota xwe daniye Bêzar.

T.X: Lê gelo dı nava pêşdahatınên we da hûn ji deb û folklor me tışteki nişan dıdın?

A.R.P: Belê, me tenê çend didem bı şeweyê miniatyûrayên kurt nişan dane. Wek dide-



Çend wêne ji tiyatroya "Pandomima" ya Yêrêvanê.

ma ji destana "Mem û Zînê" ya ku hingê mirê Muxurzeminê bî Memê ra kişikê (satranc) dî-lize, û Beko fesadiya Memê dîke. Bîlî vê ez dî-xebitîm ku şanoya "Memê û Eysê" jî, piyesa ku Xelilê Çaçan Mûradov nivisiye, pandomi-maki hazir bikim. Jî ber ku piyêsên trajedik hêsantir dîkarin bîbin şano bona tiyatroyên pandomimayê.

T.X: Armanç û nêtên we yê nê pêşerojê çî ne?

A.R.P: Dî van nêzkayan da, koma me we here Leningradê, Moskovayê, Rohûlata Dûr. Hêviya min ew e, ku rojekê em herne Kurdistanê an jî welateki wisa ku têda Kurd pîr m.

T.X: Hûn jî ku wisa kurmancike xweş dîzanînin?

A.R.P: Ez bî xwe jî gundeki Kurda me. A dîm jî, bermaliya min jî Kurd e û em lî malê pî-rani kurdi dîpeyivîm. Ango mirov gereke zîmanê xwe yê zîkmaki xweş zanibe. Û gava gûlî tê ortê, mirov gereke zendegirti (ecêbmayî) ne-mine, ku yek zîmanê xwe dîzane, lê gerek zendegirti bîmine gava ku yek zîmanê diya xwe, gelê xwe nîzanibe.

* Derheqa vê yekê da çend sala pêşda benedekê min dî rojnama "Riya Teze" da hate weşandîm. (T.X.)

DU TIYATRO..

Zîlm û zordestiya ku iro lî gelê Kurd tê kîrîm, lî dînyayê bê emsal û bê dîrûv e. Gelên dînyayê, roj bî roj bêtir bî vê rastiyê dîhesin û dîbin. Gelek kesên mirovîz, demokrat lî hember zîlma kolonyalîstan; bî daxwaza piştgriyê û dostaniyê nêziki pîrsa gelê Kurd dîbin.

Rewşa gelê Kurd, felaket û trajediyên ku ew dî van salên nêziki 2000'an da derbaz dîke; cûre û metodên zîlm û hovitiya kolonyalîstan, jî film, tiyatro, resim û helbestan ra dibe tema. Ev yek dîde xuyan, ku êdî dengê gelê Kurd hêdî hêdî xwe dîgihîne gelên dînyayê. Dî vê da bêşik para xebata welatparêzên Kurd lî dervayi welat pîr e.

"ZIMANÊ ÇIYAN"

Navê piyeseke nîwîskarê Îngîlîz ê bî nav û deng Harold Pinter "Zîmanê Çiyan" e. Ev piyese lî Tiyatroya Londonê û lî Stockholmê hat nişandan. "Zîmanê Çiyan" piyeseke kurt e, qasî 20 deqîqan e.

Dî vê listikê da, drama pîrejîneke tê nişandan. Ev pîrejîn diya girtiyekî zîndanê ye û bîlî "Zîmanê Çiyan" tu zîmanekî

Didemek jî Piyesa "Welatê min dî dilê min da ye"

dîm nîzane û dema dîçe girtixanê ku kurê xwe bîbine, destûrê nadînê ku bî kurê xwe ra bîpe-yîwe (bî zîmanê çîyan). Ew jî neçar dîmine bî jest û mimîkan his û ramanên xwe dîde xuyan.

Ev dayîk, pîrejîneke Kurd e. Zordestên ku zîmanê wê, "Zîmanê Çiyan" (Kurdi!..) qedexe dîkîm, kolonyalîstên Tîrk in.

Harold Pinter û piyese-nîwîskarê Amerîkan ê bî nav û deng Artur Miller, dî sala 1983'an da tevayî çûbûne Tîrkiyê. Wan lî wîr, derheqa gelê Kurd û zulma lî ser wan jî gelek tîşt bîhistîm. Jî nêz va bî halê Kurdan agahdar bûn. Ev herdu nîwîskar bî van agahdariyan şaş û metal mabûn. Zordestiya lî ser zîman û çanda gelê Kurd gelekî bala wan kîşandîbû.

Nîwîskar Harold Pinter lî diji vê hovitiyê, hêrs û rîka xwe bî nîwîsandîm û çêkirîna piyesa "Zîmanê Çiyan" nişan da. Ew



nîha lî gelek bajarên Ewrûpayê tê nişandan.

PIYESEK LÎ SER PENABERÊ KURD "WELATÊ MIN DÎ DÎLÊ MIN DA YE"

Piyeseke muzîqal e. Lî Swêdê, Komela Kurd lî Bollnas, te-vî grûbek mamoste û xwendekarên swêdî (15 kes) ev piyese amade kîrîne.

Amadekarê senaryoyê Kers-tin Erlandsson - Svevar û amadekarê muzîk û besteyên stran-nan Keneth Stahre ye. Dî hêla aborî da Daira Bîyaniyan a Dewleta Swêd, ABF û Daira Penaberan jî piyese ra bûne alîkar.

Piyese lî ser derketî û penaberên Kurd, tîkîliyên wan bî Swêdiyan ra û beşek jî rewş û jîyana wan e. Ev piyese herweha bangêk e jî bo piştgriya gelê Kurd.

ALFRED NOBEL

ki ye?

Alfred Nobel, dî 21'ê Cotmehê sala 1833'an da lî Stockholme hate dîne û dî 10'ê Çileyê Pêşin 1896'an da mir.

Wi lî dû xwe serweteke gelekî mezî û pêra jî wesiyetnamek hişt ku vê wesiyetname navê wi lî dînyayê meşhûr kir.

Bavê Alfred NOBEL, İmmanuel Nobel (1801 - 1872) icatkar û dewlemendeki indus-triyê bû. Wi demeke dirêj jî jîyana xwe lî Rûs-yayê lî bajarê Petersburgê derbas kir. Hingê wi lî wêderê fabriqên makinan û silahan dî-xebitandin. Dinamita bin avê jî aliyê wi va hat icatkırın û dî Şerê Kırımê da ûrisan lî dîji os-maniyan bî kar anin.

Çar kurên İmmanuel hebûn: Robert, Lud-vig, Alfred û Emil. Hemû jî dî teknikê da gele-ki jêhati bûn.

Alfred Nobel lî Stockholme hate dîne û neh salî bû çû Petersburgê û lî wir mezî bû. Jî bo xwendîne çû gelek welatan. Salekî lî Parisê kimya xwend. Wi hina dî salên pêşin da meyla xwe da ser maddeyên teqandîne û dî wi wari da xwe pêşxist û bû icatkarekî mezî.

İcata wi ya bîngehin ew bû ku wi bî saya kapsûlê pêxistîna pêşin ya nitrogliserin û mad-deyên teqandîne pêkani.


Bî qasî 1000 icatên Nobel hene. Ew xwedî-yê 300 patenti bû. Jî bo ku xwe bîgihîne enca-mekî wi hemû risk (xeter) dîdan ber çavê xwe. xwe.

Bala wi ya lî ser nitrogliserinê lî Parisê hîşî-yar bû, lî Petersburgê gihîşt û lî Stockholme bû sebebê felaketekî.

Piştî Şerê Kırımê (1853 - 1856) dê û bavê Alfred bî kurê xwe yê biçûk Emil va vege-riyane Swêd. İmmanuel dî efrandîna maymên er-dê û bin avê da gelekî serfiraz bû.

Alfred çend salan lî Rûsuyê ma paşê ew jî vege-riya Stockholme. Ew bû xwedîyê patenti jî bo metodekî teqandîne yê nuh. Dî sala 1864'an da felaket qewimî.

Başûrê Stockholme bî teqandîneke mezî hejîya. Pênc kes hatin kuştin. Dî nav wan da bîrayê Alfred ê biçûk Emilê 20 salî jî hebû.



Alfred Nobel, 32 salî, hingê lî nêzîkî ciyê qezayê bû û ew felaket bî çavên xwe dit. Vê felaketê jî têrê nekır ku ew dest jî lêkolînê xwe bîkşîne. Dî vê rêyê da qet tirs nasnedıkır. Merivekî kurtebejn û gelek jar bû.

Wi, çend mil jî Stockholme dūr, lî Mälaren laboratoareke nû avakır û lêkolînê xwe lî wir ajot heta ku reçeta xwe dit û bî serket. Dî sala 1867'an da dinamit icat kir û patenta wê wer-girt.

İcatkarê bî nav û deng Nobel bû fabriqator, ekonom û gelekî dewlemend bû. Lê wi zema-nê bêtır dîda lêkolinan û jî bo icatkırına barû-ta bê dû (Barûta Nobel), bê westan xebitî. Ū jî bo faytona xwe, wi tekerên lastik hewce dit û ew jî icatkır.

Alfred Nobel qet nezewıcı û kurkem (bê zarok) serweteke mezî lî dû xwe hişt û dî 10 Çileyê Pêşin (December) sala 1896'an da lî İtalyayê dî vila xwe ya lî San Remo da çavên xwe lî jîyanê girt.

Nitrogliserin pêra bû heta roja mırîne. Ew bîbû dermanekî hekîmî jî.

Wi weha nivisibû "Bîla jî vi dermani ra Tri-nitrin bê gotm ku dermanxane (eczexane) û xelk jê metırsın".

Alfred Nobel, wexta lî Parisê bû ew wesiyetname xwe ya meşhûr nivisî ya ku pê navê wi lî cihanê hat naskırın.

Xelatên Nobel

Pere û wesiyetnama Alfred Nobel bûye bingeh û wesila Xelata Nobelê. Pişti mirîna xwe Alfred Nobel, 31 milyon kron û wesiyetnamek hişt. Serweta wi li gor bihayê perê wê wextê geleki mezin bû.

Serweta Alfred Nobel gîşk li Fransayê bû, lê ji bo ku daxwaza Alfred Nobel bê ci, angon fondek bê sazîrîna û li ser navê wi xelat bîn belavkîrîna, pêwîst bû ku hemû malhebûna wi derbasî Swêdê bibûya. Û wisa ji bû. Bî navê wi li Swêdê sazgehê hat avakîrîna ku daxwazên wi bine cih.

Ev sazgeh (Nobelstiftelsen), idarekîrîna malhebûn, pîvandîna û belavkîrîna xelatan dimêşîne. Sazgeha Nobel bî komiteyêke karger tê idarekîrîna. Serokê Komîta Karger ji aliyê hukûmetê va tê tayînkîrîna û endamên din ji aliyê wan sazgehîna va tîn hûlbijartîna yêna ku xelatan belav dikîna. Wek: Akademiya Zanîstî, Înstîtûya Karolîn, Akademiya Swêd, Komîta Norveçî (ya Xelata Aştiyê).

Her sal pênc xelatên Nobelê tîn belavkîrîna: Xelata Aştiyê, Xelata Edebiyatê, Xelata Fîzîkê, Xelata Kimyayê û Fîzyoloji an ji medisîn (Tîp).

Xelat ji bo yek xebatekî yan ji bo xebateke tevayî li du yan ji zêdetir li sê kesan tê belavkîrîna.

Mezmahiya xelatê her sal ne wek hev e, sal bî sal li gor butça fondê dîguhure. Jî bo kesek bîkaribe xelateke Nobelê wergire, gerek e ew bîkaribe xelateke Nobel wergire, gerek e ew wek berendam bê pêşniyazkîrîna ji aliyê kesekî heye. Ew kesana jî, jî wan statû û kategoriyan tîn ku ji liyê berpîrsiyarên sazgeha Nobelê va hatîna diyarkîrîna. Dîvê şexîs pêşniyazan bîkîna. Akademi an jî sazgehên din nîkarîna pêşniyaz bîkîna.

Her sal dî 10'ê Çîleya Pêşîn (December), roja mirîna Alfred NOBEL da merasîmên pêşkêşkîrîna xelatan li Stockholmê û li Oslo çêdîbîna. Ev roj, jî bo sazgeha Nobel roja pîroz e.

Li Swêdê, Qîral xelatan pêşkêş dîke, li Norveçê jî, serokê Akademiya Norveçê.

Xelat ji peran, diplomekî û madalyake zêr pêk tê. Eger jî ber hin sedemên salekî xelat neyê belavkîrîna, ew pere li alîkî tê danîna (reservekîrîna) jî bo saleke din.

Akademiya Swêd biryara belavkîrîna xelata edebiyatê dîde.

Parçek ji "XUŞÎNA NÎL'Ê" ya Necib MEHFÛZ

NÎSAN MEHA TOZÊ Û DEREWAN

Nisan, meha tozê û derewan.

Dûyê cigarê, dî wê oda bîlînd, zîrav û dirêj da hewa giran kiribû. Dosyayên li ser teregê dî îstreheta mirîna da bûn. Ma îşê henek û pêkenîna bû, çaxa merw li rûyê bî mirûz yê personalên wêderê dînhêri. Ew personalên ku bî îşê û karê xwe yê bêmane mijûl dibûn, li kaxezên xwe qeyd dikîrîna; mesref, hatîna û çûyîna, mûri, kêzikên humamê, pîrhevok. Bîna toza ser kolanê, bî dîzi xwe berdîda hundur, her çend jî hemû pencere girtî bûn.

— Te rapor qedand? Şefê dairê pîrsî.

— Erê, wi got, bî halekî westiyayî û peşmûrde.

Şefê wi bî awîreki tûj lê dînhêri. Çîrûşk dîpekiyan jî wan awîrên wi yêna tûj li pêş wan berçavkên stûr. Gelo bî keneke bêmane û bûdala hatîbû xapandîna? Hela bînhêre çî dînitî û

Wergêr ji swêdî: X. LEZGÎN

Dî edebiyatê da Xelata Nobel ya 1988'an gîhişte nîviskarê Mîsîrî N. MEHFÛZ



ecayîbî dîqewîmîna dî wê meha tozê û derewan da!

Lî ser şef, qîsmê ku dî ser masê ra xuya dîkîr, lûvîna û guhartîneke ecayîp çêdîbû. Guhartîneke hêdî lê gelekî berbiçav. Hêdî hêdî dîhate pîfdan û dîwerîmî. Singê wi, stuyê wi, rûyê wi dawîyê da serê wi gîşk.

Anis ziq (zûr) bûbû li şefê xwe dînhêri. Ji nişkava ew ji ber wê pîfdanê ewqas mezin bû-

bû ku êdi serê wi, stuyê wi di nav wi cendegê werimî da wînda bûbûn, simayê wi êdi ne kîfş bû. Ew meriw bûbû gogek goşt. Wê goga goşt giraniya xwe wînda dîkir, ewqas sivik bûbû ku pêşiyê hêdi hêdi, paşê bi lez bilindi hewa bû. Wek daireke firoke, hilhat û li tawanê xani ket.

— Tu çîma wisa ziq bûyi li tawana dînhêri, Anis efendi? Şef jê prs kîr.

Aha! Disa xwe da dest! Hemû ziviribûn, wisa bi dîlşewiti lê dînhêrin û serê xwe dihejandin, mîna ku bêjîn "belengazê Xwedê!" Bêşik heqê şef hebû.

"Hingê bila stêrk bibin şahid! Hetta kermêş û beq ji weha naynin serê min. Marê bi jehr ji xizmeteke wisa ji qralîçeya Mîsîrê ra kirîye ku tu kes nikare bike. Tenê hûn bi kêri tîşteki nayên hevalno. Tenê gumanek maye di qîsa hevalê min da: Tu dîkani di kêlekê da bi me ra bijî, em kirêya wê ji te naxwazin, lê divê tu hertîştî hazîr biki heta em tîn."

Hema nişkava coş bû û destpê kir nameyên li ber xwe ji hev veqetand. "Berêz!.. Pîştî nameya we ya 2/2/1964, referansa we 1911, û nameyên we yê 28/3, referansa we 2008, ji me ra şeref e ku em we hayedar bikin..."

Û di gel wê toza ku bi dîzi ji kolanê dîkete hundur, dengê straneke bi argo dîhate bîhistin: "Lê dayê, hîv li ser deriyê me sekîniye.." Wi dest ji nîvisandinê berda û di ber xwe da "Allah" got.

Hevaleki îş ji milê rastê bang lê kir:

"Lo, hûn warîsên diroka herî kevnare! Bi hêviya xewneke wisa ku tucarê nabe heqîqet, hûn wek akrobatan dîxebitîn ku nanê zîkê xwe derxîn. Lê ez di nav we da, ku merweki harikulade me, ezê bê raket ji asîmanên der derbazbîm."

Şagirtê qehwê kete hundur. Laşê Anis ji ber kûrmê esrarê (abstîmensê) dilerîzi. Wi ji lawîkê şagirt qehweke bê şekîr xwest.

— Qehwa te wê li ser masa te hazîr be, dema tu ji cem mudur beg vejerî, lawkê şagirt bersiv da.

Ew gewdê Anis ê qelew û bilind, odê terk kîr. Gewdê wi gran bû, ne ji ber şîşmaniyê, lê ji ber ku hestiyê wi gir bû.

Çû li pêşberî masa mudur bêdeng sekîni. Mudur, serî wi di berda, bi hîv kaxezan va mijûl dîbû. Serê wi yê rût di çavê Anis mîna binê kekeke ku deverû ziviribe, xuya dîkir. Wi

hewl dîda ku li wêderê baş hay ji gotîna xwe hebe, ku tu çewtiyekî neke û nekeve rewşeke hîn xîrab. Di dawiyê da mudur, rûyê xwe yê çargoşe rakîr û awîreki tûj da wi.

"Gelo dibe ku çewtiyek bi dîzi ketibe rapora min? Ya ku min ewqas bi itîna amade kir!"

— Min ji te tîka (rîca) kîr ku tu beyanata pêşketîna hatînen meha çûyi bi awakî fireh rapor biki.

— Belê rast e Beg efendi... û min ji beyanateke wisa pêşkêşî zatê we kir...

— Eva ye?

Wi li raporê nihêri û destnîwîsa xwe ya li ser zêrfê xwend: "Beyanata pêşketîna hatînen meha Adarê, ku li ser daxwaza mudurê giştî yê arşîvê hatiye nîvisandin."

— Belê eva ye Mudur beg.

— Bînhêre û bîxwîne...

Li jora kaxezê pêşîn çend rêzên destnîvisandî yê nînd fîyaqê dîkîrîn, lê dûra valahî dîhat. Şaş mabû, bi lez ew pelên gemarî dîqelband. Hemû rûpelên mayîn vala bûn! Serê xwe vejerand, wek evdalekî li mudur nihêri. Mudur êdi hew dîkarîbû hêrsa xwe bigre.

— Bîxwîne!

— Mudur beg, min rapora xwe peyv bi peyv nîvisî.

— Ka ji min ra bêje, kuda çû dûmahîka wê?

— Bî rastî ev tîşteki ecêb e.

— Şûna serê pênuşekî li ser kaxez xuya dîke.

— Serê pênuşekî?

— Ka wê pênuşa xwe ya bî tîlsîm bîde min.

— Mudur rahişte pênuşê û xwest bi wê çend xêzîkan li ser zêrfê bîkîşîne. Tu tîşteki xuya nekîr.

— Têda dîlopek murekeb nemaye.

Her dîçû û nerîhetîya ser çavê Anis bêtîr dîhate xwendî. Mudur bi gazînc jêra rewş şîrovekîr:

— Dîyar e ku te destpê kir nîvisand û murekeb têda hindîk mabû û zû xelas bû, lê tu hay jê nebûyi, te her domkîr û nîvisand...

Hêrs û meraqa mudur tevîhev bûbû.

— Ka ji min ra bêje Anis! Çawa bûye ev tîşt?

"Erê çawa? Di zemanê pîr kevnare da çawa bûye ku can û lîvîn bi hêşînahiyên di navbera kevirên bîndî deryayê ketîye?"

— Tu ewqas korefam nîni! Bî qasî ez ji te fam dîkîm Anis efendi!

Anis bêdeng serê xwe xûz kîr.

— Di şûna te da ez bersiv bîdîm. Te bi xwe nedîdît ku tu çî dîki, çîmkî tu serxoş û tevîzi bûyi.

Dûmahîk rûp: 6

Cejna Gelê Kurd, Nişana Serhildanê

NEWROZ

BI ŞAHÎ HAT PİROZKIRIN

Îsal ji Newroz li welat û li dervayi welat bi şahi hat pirozkirin.

Lî zanîngêhên Diyarbekirê, Îstenbolê û li gelek derên din, xortên Kurd cejna Newrozê piroz kîrîn.

Lî dervayi welat ji, bi taybeti li Elmanya Federal, wek her sal bi dehhezaran Kurd li hev cwiyan û Newroz bi şahi piroz kîrîn. Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan - KOMKAR'ê civin û şahiyên mezin pêk anin: Lî Manheim, Berlina Rojava, Diusburg, Bremen. Lî bajarê Hamburgê ji TEVGER'ê Newroz piroz kîr. Dî van hemû şevan da li ser qetliama Helepçê pandomîmek hat nişandan ku gelekî bala xelkê kîşand.

Lî Swêdê ji KOMKAR-Swêdê û Federasyona Komelên Kurdistan şahiyên mezin pêk anin. Lî Parisê, Kopenhagê, Den-Hagê û li gelek bajarên din ên Awrûpayê şahiyên Newrozê pêk hatin. Dî hemû van şahiyên da li ser bist hezari (20 000) kes beşdar bûn.



Dî dehê adarê da, bi amadekariya Komela Karkerên Kurdistan (KOMKAR-Swêd) li Stockholmê NEWROZ bi şahi hat pirozkirin. Dî şahiya cejna Newrozê da ser 2000 kesibeşdar bûn. Bi hejmareke bilind swêdi ji hatibûn cejna Newrozê. Yek ji wan ji rojnamevan Barbara Brädefors bû. Wê dî rojnama Norrskens Flamman (organa Partiya karkerên Kommunist) da, bi nivisareke dirêj behsa cejna Newrozê kîr. Me ew nivisara wê wergerande Kurdi û li jêrê pêşkêşî xwendevanan dîkin. Bi çavê keseke biyani, li Stockholmê kurdan cejna Newrozê weha piroz kîrîn:

NEWROZ-sersala kurdi ji bo çand û têkoşinê

Roja inê ya 10'ê Adarê, Komela Karikerên Kurdistanê (KOMKAR-Swêd), cejna sersala kurdi piroz kir.

Sersala Kurdan NEWROZ esasen di 21'ê Adarê da tê piroz kirin ku ev roj herweha Roja Lî Diji Nijadperestiyê ya Miletên Yekbûyi ye.

Di cwinê da du tiştan derhal bala merw dikişand: Beşdari —Salon heta trubinan tiji bûbû— û programeke geleki baş rejisekiri ya ku çandeke têkoşer pêşan dîda.

Lî Stockholmê, ala kesk û sor rojeke zer di ortê da dibiriqi, ya ku ne li Tirkîyê, Îranê, Iraqê û ne li ji li Sûriyê (ciyê ku 20 milyon Kurd lê dijîn) nişandana wê serbest e. Û nişandana wê yekser qedexe ye li Kurdistanê serbixwe, ku armanca Kurdan a siyasi ye. Lî Folketshusê (Mala Gel) komeke zarokan marşa netewî ya Kurdan xwendin, lê bi zimanê ku li Kurdistanê Tirkîyê qedexe ye, ciyê ku li gor rejimê qet Kurd lê tunene!..

Kurdi zimanekî Indo-ewrûpi ye, ango şaxekî wê dara ziman e ya ku zimanê Swêdi ji şaxekî ji wê darê ye. NEWROZ tê mana "Ny Dag" (Rojê Nû) û peyva pêşin (new) vekirî dide xuyan ku pizmamtiya wê bi peyvên wek ny, new, neu an ji "novuj" a rûsi ra heye. Pirozkirina cejna sersala Kurdan, ku isal cara 2601'emî e, kevînbûna medeniyeta Kurdan nişan dide. Hezar û pêncsed sal berya destpêka salnama me (miladi) destpêkiriye. Lê belê di pirozbahiya vê rojê da tiştê grîng ne zêdekirina salekî li vê salnamê bû. Lê grîngtirin mebest ji pirozkirina Newrozê, pêşkêşkirina têkoşin û berxwedanê bi hemû êş û dijwa-

riyên wê va bû. Mirov ev yek di nav stranên da, di govend, helbest û wêneyan da û di piştgiriya navnetewî da didit.

Dûra slavname û mesajên piştgiriyê ji hatin; ji Wezirê Biyaniyan, Komita Aştiyê Ya Swêd, APK (Partiya Karikerên Kommunist), VPK (Partiya Kommunistên Çep) û herweha ji dervayî Swêd. Govendên Yewnani û Latînamerîkî ji slavnameyên sersalê bûn. Ew çar saetên pirozkirinê bi kêfxweşî mezî û bi pergal û rêk û pêk derbas bû. Lê di ketina hundur da kontrolkirina berik û çenteyên mêvanan, li ser paşxana (serborî, serhati) siyasi ya Kurdan hun tişt bi bira merw dîni. Dilnexwazên Kurdan pîr in, ew di bin êriş û zordestiyê da ne. Gelek caran li ser wan rasterast metodên qirkirinê û tunekirinê tên bi kar anîn, wek Helepçê. Lê heta li welatê penaberan Swêdê jî, Kurd bi awakî pîr xirab, bi şika teroristiyê tên naskirin. Lema avakirina komiteke piştgiriyê ya Swêdiyan, bi şahiyê mezî ji alî Kurdan va tê slavkirin û dilxweşîya xwe nişan dînin.

Bajarê Helepçê li Kurdistanê Iraqê, ku di 16'ê Adarê 1988'an da ji alî balafirên Iraqê bi bombeyên gazên jehrê 5000 kes têda hatin kuştin û 7000 kes jî seqet û birindar bûn, şahidiyê teze ye ji bo vê rastiyê, ku gelê Kurd di bin tehdida qirkirinê da ye. Biranina qurbanên Helepçê di vê cwinê da ciheki grîng girtibû.*

Gelek artistên Kurd yê mezî û rûmetbilind di şevê da beşdar bûbûn, wek: Xalî, bi zîrna xwe ya hîzkirî meqamên Kurdi lêdixist; me guh-

KURDISK NYÅRSAFTON
NEWROZ
NÎŞANA SERHILDANÊ



kultur solidaritet kamp

program:

- ŞIVAN - GULİSTAN û Grûba Kîne Em
- ARAMÊ TİGRAN
- NASİR REZAZÎ û Grûba Agri
- FIRAT
- FERHAD BABAN

Plata: **FOLKETS HUS**

10 MARS 1989
kr. 18.00

ARR: Svensk-Kurdiska Arbetarförbundet KOMKAR Swêd

dariya stranbêj Fîrat kir û dengê şairê mezî CİGER-XWÎN, ku li Swêd wefat kiribû, bihist. Me guhdariya Ferhad Baban û Nasîr Rezazî kir.

Şahî û kêfxweşîya şevê xwe gihande tanga herî bilind, dema herdu hunermend Aramê TİGRAN ê Ermen û Şivan PERWER ê Kurd derketin. Lê diyar bû ku guhdar, bi hatina mêvanê şevê yê ku ji Yekitiya Sovyet hatibû, gelekî dîlxweş bûn. Bi milyon Kurdên Rojhilata Navîn ku zimanê wan qedexe ye, her wisa guhdarîkirina radyoyên dereke ji (bi zimanê Kurdi) ji bo wan qedexe ye. Lê ew dişa ji guhdari dîkin û wan ji Radyoya Erivanê, guhdariya Aramê Tigran kirine û dîkin. Lî Stockholmê, ev cara yekemî bû ku Aramê Tigran qasî saetekî rêzek mucewher ji stranên Kurdi ji guhdarên xwe yê hezkirî ra pêşkêş kir. Beşdarbûna wî di konserê da, wek nişaneke piştgiriyê bû ji Yekitiya Sovyet.

Cwîna qeşbalix, slavnamekî ji ji Sekreterê Gîştî Yê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê Tirkîyê Kemal BURKAY wergirt.

BARBARA BRÄDEFORS

* KOMKAR niha li ser Helepçê, di Seraya Kulturê da raxistînek vekirîye.

JÎ DÎROKA KURDISTANÊ

Jî Gernama
EWLIYA ÇELEBÎ



HEZARFENÎYA EVDAL XAN

Wergêr: DILSOZ

Jî xeynî ku xwedi ilmê Kimyayê, Simyayê (Kîmyaya kevn), gelek cûreyên felsefê û ilmên xerib (tıştên nedîtî û nebihîstî) bû; li ser ilmê kevn û hedisê jî wisa hostayek jêhati bû ku Calinus, Bokrat, filozof Sokrat, Filkos û bijjîkên (doktorên) kevn li ba wi hêj ne zarokên ber ebçetê (destpêka xwendina erebî) bûn jî. Lewra ew, bijjîkê insanên dewra xwe bûn. Lê ev Xanê han, li gor siruştaya mirovên jar û qels yê wê dewrê nebıznas, hecamkareki hosta û gihîştî bû. Hetta mirovek jar û çilmızı ku, bûbû wek hestiyê ladesê û dilê afyonê bû dîke hemamê, dermanek dîdê û wisa lê dînhêre ku jî pesîndayînê ra zîman têr nake. Ev mirovê jar, di nava sê rojan da radibe ser piya û hînarên rûyê wi dibe wek sêvek sor û gizri. Can dîde gelek kesên wek piya.

Dî cerahiyê da kesi wek wi tune. Mirovên ku jî hespan, baniyan û xaniyan dîkevî dîpê-

çe û di nava heft rojan da wan radike ser piya. Hetta cûreyek dermanê wi heye ku, yeki ku ciheki xwe şikandibe vê dermanê dîxwe û bî vê hawê nava wi yê zirav, dibe kemberê Îskender.

Û her wisa sıwareki çeknas e; dema ku li hespê kîhêl û babezayî sıwar dibe û cırîta davêje, listîkvaniya Çevganê (Roja Nû, hejmar: 20 bînhêrîn) nişan dîde xwe wek Rustemê Restan ê Zabilîstan yan jî Sefatê Îranîstan dîbine; û li gor qewlê pirtûka Baytarname, nexweşînên laşê hespan wisa zane ku, tu dîbê qey Huşengê Şah e.

Û wisa nêçîrvan bû ku, li çûkxana wi bî sedan teyr, çaqır, balaban, zaxanos, başoke, seyfi, toyger, kirkıl, kırçixa, reşçûk, baz, çavreş hebûn û van çûkan hîni xwe kîrîbû. Salê careki li newalên Bîdlîsê, di "roja koçbûna kewan" da di rojeki da nêçîra heftê hezar kewî dîke

ku, dî sicilê da nivisandiy ye. Lê ev nêçir, salê careki bî fermana Evdal Xan tê kîrîn; hemû eşîrên Kurd sê roj lî çiya û newalên Bıdlisê —ku tîji heywanên kûvî bûn— dîgerin, bê hed û hesab, bî sedhezaran kew tên kuştin û sê meh lî bajarê Bıdlisê goştê kewan tê firotn. Lî wê mîntiqê hemû bîncihên Bıdlisê jî goştê mîh û berxan têr dîbin. Dî nav Kurdan da, jî vê nêçîrê ra dîbêjm "helo", û bî dengê sedhezaran Kurd çiya tên hejandin. Evdal Xan pîsporê nexweşîna bazan bû. Zîkê hînekan dîqelaşt û jê kîrêc derdîxîst; rûviyê hînekan derdîxîst û cardîm bî hûrê wan va dîdirût ku, bî emrê Xwedê baş dîbûn û ew bazên jîr cardîm nêçîrê dîkîrîn; seriya nîkulê hînekan jêdîkîr, çeltîk lî baskê wan dîxîst û neynok bî wan va datani. Baskê bazên ku guri yan jî kul û bîrîndîbûn, bî ava sîrkê du caran baş dîşûşût û paşê bî zêrkuta zêrkeran tovê kundîrên avê dîkuta û bî zîravê dewaran (ga, çêlek û wd.) hevîr dîkîr, baskê bazê dîxîst nava şûşê û dema ku xwîna bazê yê pis wek pîzîk lî ser enîşka wî dîcîviya, wan pîzîkan bî dûzanê jî du cihan dîqelaşt û bî emrê Xwedê wan sax dîkîr. Bî kurtî, dî ilmê bazname da Mînuçehrê Sani ye.

Derheqa nexweşîne çavan da wîsa qabîliyetên wî hene ku, mîroveki ku jî çîl salan vîrda perde yan jî ava reş kîşiyabe ser çavê wî, bî emrê Xwedê baş dîke; mîn bî xwe dît ku çawa mîleki xwar —ku nava mîlê vala bû— jî kânika çav dîxe hundîr û dema ku mîl dîgîhîje paşîya çav, Evdal Xan, lî wê mîlê dîmîje û ava reş a ku jî hulm û gulmê çêdîbe dîkîşîne der, çavên wî kesî sîpîsax dîke.

Dî ilmê mîmariyê da wîsa zanayê geometri ye ku şîkîl (model), avayî û wêneyên vê koşka granbuha (ne xuyaye ku kîjan koşk e, lê dîbe ku koşka Evdal Xan bî xwe be) bî emek û marîfeta wî bî xwe hatiye lêkîrîn, ku emsalê Koşka Belqîs û Koşka Kaydefe ye.

Û dî marîfeta cîldkeriyê da, te dîgo qey cîldkerê Suleyman Xan ê mezin e.

Dî ilmê wêne da, wek Behzat û Manîvar teswîrên heşmetkar diafirand ku çaxa mîrov dîbine, mîrov dîbê qey bî can e; û dî ilmê nivîsinê da bî qasî Îmat û Mir Ali, Kutbuddin Mehmet Yezîdî hunermendê nivîsa edebî ye.


Dî ilmê helbest da, yekemîn mîrovê dewra xwe ye. Dî qasîde û çarînnivîsê (rûbainivîsê) da, emsalê Azmîzade Haletî, Camî, Hafîz Şîrazî û Saîp e. Û wîsa xwedî zîmanekî pêşketî ye ku, gava pîrtûkeki erebî digre destê xwe hemû bendan bî hostatî û lî gor qaîde dîxwîne, bî şa-

rezayî xwendîne dînexşîne, xurt dîke û wîsa jî bî zamînê Tîrkî, Erebî û Farîsî bî hêsanî dîxwîne û dîaxîfe. Her weha wek derya, bî kultur û nivîskar e.

Û hesînkereki hosta ye; wîsa şûr, xencer, kêrên Sincanî, Mekranî û zîvîn çêdîke ku, lî karxana Îsfahanê jî nîkare şûrên wîsa tûj û wek agir çêke; ihtîmala qelbîn yan jî xwarbûna devê şûrên ku ew çêdîke tune.

Û hostayekî zêrker e ku, hemû emaretên granbuha bî destê xwe dînexşîne û çêdîke; jî sîrmeyên cûre cûre wîsa hevîsar û gulîkên hespan çêdîke ku, bî sê hezar quruşî dîfroşe û her sal yek - du jî wan jî padîşahê Osmanî ra wek diyarî dîşîne, ku layîqê dîtnê ne!.. Û lî ser dara tutûnê bî rêzên cûrbecûr hûrmîrcanan wîsa darek çêdîke ku jî qeweta insan der e.

Saet-çêkîreki hosta û gîhîştî ye. Saetên ku çêdîkîr meh, roj, bûrc, salname û şîyarkerê xwe hebûn ku, Can Petro Kaşîr jî, nîkarîbû dî nav saeteki da ewqas marîfet bî cîh bîne. Hetta lî ser gustîlka bavê me yê rehmetî dagîrkerê Egri Mehmet Xan, saetek çêkîrîbû û dîgel vê saetê dî gustîlka bî mor ya tîliya wî da saetek bî cîh kîrîbû ku, saet, wek eserê sêrê dî wextên kîfşîkîrî da wek neşter lî tîliya xwedîyê xwe dîxîst ku, mîrov êdî zanîbû saet çend e û çî wext e. Yek jî wan gustîlkên bî mor jî, dî tîliya Xanê Mehmûdîyan—Begê Ewliya (navê gundekî ye)— da, ango dî tîliya zavê E.Xan da bû. Ew jî, îşê Evdal Xan bû.



Minyatur: Melayekî sîhêrbaz lî ba Evdal Xan huner û hoqebaziyên xwe nîşan dîde.

Û hostayê mor-kolinê û morvanîyê bû; bî qasî Ahmed Beg, Ferît û Seyrî gotînen xweş û bî mane dînvîsî, kevîran (kevîrên granbuha) dîkola, lî ser kevîr, çerm û hwd. dînvîsî ku,

emsalê wan tune bûn. Hetta bî cûre cûre kez-zap, lî ser Yemini xetên sîpi dînvîsi. Xwedi morên wîsa bû ku, cih û zeman nişan dîdan, tucar xeranedibûn û wek tiştêki mûcîze bûn.

Stranbêjeki gihîştî û hosta bû ku, dî ilmê muzikê da wek diya meqamê rast û bavê meqamê dûgah bû. Kar, nexş, awaz, zecel, teswir, niviskari, gotin, çarin, varsagi, stran, kayabaşî (cûreki muzikê- bî tîrki) û maniyên ku Evdal Xan jî heq derdiket, stranbêjeki pîspor jî heq dervediket, tu dibê qey Figasorê tevhit, Abdullahê Faryabî û Gulamê Şadide bû. Bî awazê Hafîz, heta tu bêjî bî dengekî bilind dîstirîya. Dema ku dîstirî, guhdaran dev jî karê xwe berdîdan û bêşik jê ra heyran dîman.

Û wîsa sazbandeki hosta bû ku, bî hunermendiya xwe jî Shehrap yan jî Barcenki, Ali Rebabî kêmtîr ninbû; Çenk (dirûvê kanûnê pê dîkeve, tik tê girtin û lêxistîn), sentûr, tembûr, şeştar, çartay, ûd, keman, kanûn, qîloç, nûkreği, balaban, bilûr lédixist û bî kurtî xwedi 160 cûre aletên muzikê bû. Wî bî xwe van aletên jorin çêdikir. Û wîsa sedefkareki hosta bû ku, te dîgo qey Qızılcanê Hindî ye. Dî azan xwendîne da wek Bilalê Hebeş; dî çalakiyê da wek Emir Umîye Zahir; dî karê civatî da Selmanpak, Zunnûrê Mîsrê û dî teswirê da wek Sheybê Rûmî bû. Dî waz û şîretê da Hasan Basrî ye. Dî şîrovekirîne da Abdullahê kurê Abbas e. Û dî çeknasi da Malik Uştur yan jî, duldulswar Esedullah Ali ye (Hz. Eli). Dî tiravêjî da Muhammed ibni Hezretî Ebûbekîr; dî kemanbendiyê da Saad Vakkas; dî camêriyê da Hatem Tay û Cafer Berkemî; dî parêzgiştîne da (perhîz) Ebû Derdê Amîrî ye ku, bî rojgirtîna Daut jiyana xwe dîmeşîne. Rewşa gel perîşan bû. Lî xelkê nanbelavkirîne da Omer bin Umran bû. Dî hunermendiya agirbaziyê da (yên ku bî agir hin huneran nişan dîdan) Ebû Omer Abdullah Vasîtî; dî afirandîna şûşe û şûşebaziyê da Ebû Ali Sîna bû.

Hemamek wîsa ava kirîya ku, tu dibê qey Muhsin İbni Osman e. Lî jêr tê teswirkirin.

Dî boyaxvaniyê da wek Zeyyid Hindî bû. Dî hunermendiya dirûtinê da wek Dawud Tahîrî ye. Dî cilçêkirîne da Zahîdê Kutân e. Jî destkariya xwe jî Melek Ahmet Paşa ra secadeki nexşkîrî diyarî dîke ku, lî Mîsrê, İsfahanê secadê wîsa nayê çêkirin. Û dî çêkirîna cûrbecûr kumên tiftik û tacên Bektaşî da Abdullah Vasîtî ye. Dî kurkvaniyê da mîrov dibê qey Omer bin Amîr e; dî çêkirîna kumên kulav û secadên kulav da Ebû Said Kari ye. Û dî

hesinkeriye da (hedadi da) Abdullah Kûfî ye. Dî ilmê şîr da emsalê şairê Hezret, Hasan Sabî e. Dî hesinkeriye da Ebû Zeyid Muslim Haddad e. Dî qazan vaniyê da Ebû Habîb Mu-hiddin e. Dî derzivanîyê da Ebû Qasîm Ennar e. Dî ilmê beytariyê da , bî xwe, wek Ebû Qasîm Hakem e. Dî zêrkeriyê da Nasîr bin Abdullah e. Dî çêkirîna cûre cûre dermanan da -jî gihayan- Hasan bin Nasîr e. Dî çêkirîna pûşiyên xweşik da Husam bin Abdullah Basrî ye. Dî herîriyê da (ipekvani) Abdullah Cafer Tayyar yan jî İmam Mehmet Gazalî ye. Dî çêkirîna cûrbecûr Çerkezîyan, kuman û hwd. da te dîgo qey Ekber Yemîni ye ku bî xwe navê pîroz yê Muhammed e. Dî çêkirîna xalî û xalîçeyan da, diwan û zinên nexşkîrî da Ebû Nasîr Hatem Baxdadî ye. Dî karkeriya pembû da Amîr bin Basîr e. Dî çêkirîna şûran da Esîrê Hindî Seyyat e. Dî çêkirîna mertalan da hunermendiya Hesên Fenal Gazî nişan dîda. Û dî golê da -ku wî çêkirîbû-, wek Nasrullah Semmak nêçîrvaniya cûrbecûr masîyan dîkir; bî tor û nîkan masîyên Semek dîgirt. Wîsa tiştên ecêbmayî dîkir ku, Abdullah Harrat bî xwe nîkarîbû wan tiştan bîke.

Hetta kevçiyên gilover, yên ku pê av berdîdan nava hubur, sehpayên gîranbuha û kilên İsfehani tevi milkêşên wan çêdikir û cih bî cih wek diyarî dîşand. Bî gurzan qalîbê tirên cûrbecûr çêdikir ku, jî qula derziyê derbas dîbûn û Muhammed İbni Umran nîkarîbû wîsa çêke. Hetta jî sed û pêncî parçe zil tir çêdikir ku, jî nişangeha tirê bigre heta serê tirê nava wan vala bûn. Bî van tir û kevanan wîsa qonaqek dîr tir avêtiye ku, bî rasti buhayê kevanê xwe derxistiye qata herî bilind. Dî nişanderbiyê da emsalê Sam e ku, dî berdana tireki da qona-xek lî pêş û du qonax lî paş wî, lî pêşberî Sultan Mûrat lî nişanê dîxe û jî ber vê yekê baca (vergi) seranserî Mûşê dîdan wî. Jî xeynî van nişangerîyan, xwedi gelek nişangeriyên dîn bû jî, ku mîrovan ecêbmayî dîhişt.

Dî boyaxvaniyê da wek İbni Abdullah Us-Siyyah bû.

Û jî sazîna ra bî xwe kirîşan çêdikir ku, Pir Omer bin Nasîrulvekar jî nîkarîbû tarên (cûreyek saz) wîsa bî huner çêke. Hetta jî rûviyên çûkan, jî saetan ra kirîşê wîsa çêdikir ku, deh sal emîr dîkirin. Cûrbecûr kase, cêr, dizîk û kodîk çêdikir û wana wek herîr dînexşand ku, Pir Abdullahulgaffar jî heqê kareki weha dînediket. Û jî bo kedhelaliyê çandîni û dehkaniyek wîsa dîkir ku, Riyas bin Omer-ulharras

nikaribû çandniyekî weha bike; Hindi Baba Refen ew bî xwe ye, jî ber wê yekê van bax û baxçeyan, baxê cînan tên zîman.

Bî kurtî Xwedê aql, jîrî û tîgîştî dayê. Jî xeynî hunermendiyên ku lî jo hatî tarifkirin, bî hezaran hunermendiyên din jî, jî destê wî tê û vana îspat kirîye ku, wek Cemşîdê Sani ye. Eger mirov bixwaze her marifeteki wî jî bîngêhî û tevî şaxên wan aşkera bike, wê cildeki dagire. Û çarde (14) kurên wî Şêxzade Ziyaeddin, Bedir, Nûruddehîr, Şeref, Îsmail, Şemseddin, Hesên, Huseyîn û kurên din jî, bî tevayî hezârfen, pîrmarîfet û şêxzadeyên hosta nîn. Her yek jî wan dî gelek ilm û marifetên cihê da hunermendiyên xwe nişan dane ku, jî bo wê yekê dî xusûsiyetên marifeta hezârfeniya Xan da dîgel hostatiya afirandînen jîrî û marifetên din, hate nivîsandî ku, hostayên ku navê wan derbas bûn lî pêşberî Hezretî Resalet, Hezretî Eli, Hezretî Selman Pak kemberên xwe girêdîdî û bûne pîrên xwedî şalîk.

Evdal Xan jî huqebazî, şûşebazî, agirbazî û hemû hunerên din agahdar bû. Dema ku cilê xwe yê risin lî xwe dikir û lî meydana xwepêşandanê hunerên xwe nişan dîda, hemû temaşevanên wî heyran diman, nefes lî wan dihate

bîrîn. Hetta dema ku bî navê Tûrna cambazek hat pêşberî Evdal Xan û marifetên xwe nişan da, E.Xan hanhanka cilê xwe yê risin lî xwe kir, defan da lêxistî teraziye (darê balansê ya ser bend) sitend û bî dengê Allah Allah wek kêzik derket ser bend; lî ser "dergûşa ecêl", ango bendê lî hewa kişandi gelek marifetan nişan da. Dema ku lî kêlek û ser çokan xwe hîlavêt, jî nişkava dareki bendê hîlweşiya û Evdal Xan, wek teyrê Ebabil bî hewa ket û pêra jî bî şîd hate xwarê. Dema ku kete xwarê bî henek, " ez jî esman tîm hêyyy!" got û darê destê wî bû du parçe, û Xan wîsa lî erdê ket ku piyekî wî şikiya. Gava piyê wî şikiya, hewarek bî esker û malbata wî ket ku, te dîgo qey qiyamet qetiya. Pîştî ku Xan gîştî hareme, hema wê gavê piyê xwe mûmya dîke û roja sîsiyan dertê diwanê; bî hemû dostan ra rûdîne. Hezar qurban tî jêkîrî û lî feqîran tî belavkîrî. Dema ku mîn, vî serpêhatiya han bî riya texlîtkîrîne, jî Melek Ahmet Paşa ra got, bêyi ku bikene şaş û metal ma. Jî wê çaxê heta niha piyê wî (piyê E.Xan) topal bû. Bî kurtî dî ilm da, bî her awayî xwe gîhandîye û destkariya xwe eyan kirîye.

Gername, Cild: IV, rûp: 100 - 104



Hunermend MIHEMED ŞÊXO wefat kir

Gelê Kurd, stranbêj û muzîkçêkîreki hêja wînda kir. Mîrîna hunermendê mezin Mihemed ŞÊXO, Kurdên ku wî nasdikîrî jî nasdikîrî jî xemgîn kir.

Mihemed Şêxo, pîraniya emrê xwe dî riya rîzgarbûna Kurdistanê da buhart; bî stran û tembûra xwe dî sefên welatperweran da cihê xwe girt û jî bo şiyarkîrîna gelê Kurd, lî dij kolonyalîstan xîzmeteke mezin kir.

Mihemed ŞÊXO, lî Qamişliyê rûdînişt û jî gundê Xecokê bû. Jî ber xebata welatperwerî, gelek zulm û teda dît. Lê wî lî ber zordestiya dijîmîn serî danani û xebata xwe bî rîk domand. Dî sala 1974'an da derbasi Kurdistanê Iraqê bû û pîştîgîriya şoreşê kir. Pîştî tîkçûna şoreşê, derbasi Kurdistanê Îranê bû û lî wêderê zewicî. Pîştî çend salan cardî zivîrî Kurdistanê Sûriyê û kar û xebata xwe yê welatparêzî lî wir domand.

Ew, dî destpêka Adara 1989'an da, dî emreki xort da (dor 50 salî) bî nexweşîna dîl jî nav me çû heqîya xwe. Gelê Kurd, wê hunermendê xwe Mihemed Şêxo tîm bî bir bine!.

Maria Leissner : "EW NE KAMPIN GIRTIXANE NE!"

Wek tê zanin, niha 37 hezar penaberên Kurd yên ku ji ber bombeyên jehrê ên kolonyalistên Iraqê revine Kurdistanê Tirkîyê, di çend kampan da hatine bi cih kirin. Ew di rewşeke pîr xirab da dijîn.

Di meha sibatê da, 5 ji Swêd û 1 ji Danimarkayê, 6 parlamenter bi awaki resmî çûn li van kampan geriyên û derheq rewşa wan da lêkolîn çekirîn. Di nav koma parlementeran da mebûsa Partiya Gel (Fp- Swêd) Maria Leissner ji hebû. Me derbari van kampan da jê pirs kir û wê ji bersiv da:



ROJA NÛ: Penaberên Kurd di çî rewşê da dijîn? Xwarina wan, doktor û dermanê wan hene? Gelo ew têra xwe alikariyê distînin?

MARIA LEISSNER: Wan zor-bela canê xwe xilas kirine. Lê hew! Tirkîye ne xwediyê wan imkanan e ku jiyanê mirovî bide penaberên Kurd. Ji gelek aliyan va kêmasiyên mezin hene. Belê xwarinê didine wan, lê xwarinêk yek-cûreyî ye û bê sewze ye. Pîr hindik goşt, şîr û meywe didine wan. Bi taybetî zadê hişkîrî wek nok, nîsk û birinc e. Û ji bo wadekî dirêj diwar e, xasîma ji bo zarokan, ku mezin dibin û gelekî hewceyî xwarinê ne. Dayikan pîr gazinc û lome dikirîn ku, nikaribûn xwarinêke qenc bidine zarokên xwe.

Li gor bawerîya min, tiştê herî dijwar pîrsa starbûna wan û serma hişk bû. Penaber, li çend kampên cihê hatine ciwarkirin. Kampa çadîran li başûr, li herêmeke germtir dikeve, lê bi şev zehf sar dibe. Û qasî em têgihîştin, têra wan êzing û komir ji bi destê wan nediket ku sobe û kuçikên xwe vêxin. Di wê sermayê da germkirina zarokan tiştê herî dijwar bû.

Û kampa herî xirab ya Mûşê bû. Heta bêji xirab bû. Tiştê gelekî ecêb e ku ji hebûna kampeke wisa ra hê iro ji musade tê kirin. Ew xaniyên ku li Mûşê dane penaberan, hina çend sal berê hatine kifşkirin ku ew ji bo starbûnê ne musaid in. Tengbûna wan xaniyan û serma wira serbariser. Wexta em hatine wir, serma bi şev 29 derece di bin sifirê da bû. Û me bi çavên xwe dit ew xaniyana çiqas xirab bûn. Gelekî adî bûn, diwarên bêtonê yên tenik û neizolekirî bûn. Penaberan, bi pine û paçan dixwastin penceran bixitîmin, ku bayê sar û serma neyê hundur. Lê ev ne çare bû. Bi nava rojê tim li derva bûn. Bêçare çî bikin, çimkî xani pîr teng bûn. 10 - 12 kes di odeke

pîçûk da nikarin zemanekî dirêj bîmin. Hema - hema gîş bi zekemê ketibûn û nexweş bûn. Bi kurtî di halekî pîr xirab da bûn.

Tiştê herî eşkere ye wekî Tirkîye mecbûr e ji derva alikariya navnetewî qebûl bike. Mejbûr e destûrê bide Komîsariya Penaberan a Miletên Yekbûyî (UNHCR) ku werin kampan û alikariyê bikin. Ji bo serrastkirin û başkirina rewşa kampan, yekane çare eva ye.

Tiştê herî din ku gelekî ciddî bû; ku xelk di girtixanê da bûn. Ew ne kampên penaberan, lê kampên girtî û hêsiyan bûn. Çarmedora kampan bi dirêjî hatibûn çemberkirin. Tim di bin çavênê û kontrola eskeran da bûn.

ROJA NÛ: Raya gîştî a cihanê pê dizane ku ew ji ber bombebaranên kimyayî yên Iraqê, neçar mane û revine. Iraq inkar dike ku çekên kimyayî bi kar aniye û Tirkîye ji alikariyê dike ku şopên vê hovîtiyê veşêre. Te çî dit, çî bihist di vê gera xwe da? Întiba te çî ye?

MARIA LEISSNER: Herçend zemanekî dirêj di ser bûyerê ra derbas bûbû jî, me gelek delil û îsbat bi çavên xwe dit an jî bihist. Tiştê herî veşartî nîne. Ne Iraq dikare inkar bike ne jî Tirkîye. Paşê sefirê Iraqê li Stockholmê, di cîwînekê da ji grûbeke parlamenteran ra got û qebûl kir ku Iraqê li dijî Kurdan bombeyên jehrê bi kar aniye. Argumenta wî jî ew bû ku pêşiyê Îranê bi kar aniye û paşê Iraqê.

Bi rasti ev şîrovekirin û mazeret pîr tiştê herî ecêb e. Û li gor pîsporên Wezareta Derva ku min ji wan bihist, ev iddia û şîrovekirin ne di cih da ye, û Iraqê bi karanîna çekên kimyayî li dijî Kurdan, mafê gelan avitiye bin piyan û li dijî peymanên ku wan bi xwe ji imze kirîye radweste. Qebûlkirina vê mazeretê ne mumkun e.

ROJA NÛ: *Tirkiye, Kurdan wek penaber qebûl nake, û bî vi awayi ji nahêle ku ji hundur û derva alikari bigije wan. Heta rê nedan ku Komisaria MY ji ku bikevin nav kampên penaberan.*

Mîrov bî çî awayi dikare vi tewrê Tirkiyê şirovebîke? Lî gor ditina te, diwê mîrov çî bike ku hoyên jiyana wan çêtir bibe?

MARÏA LEÏSNER: *Rast e, Tirkiye ne dihê-le Kurdên Tirkiyê alikariya heval û pîz mamên xwe bike, ne ji dihêle ji derva alikariya navnetewî were van kampên. Wan rê li ber rêxistinên humaniter ên Swêdi ji girtin. Bî qasî nivsali, wan destûr nedan MY û UNHCR ku bikevin van kampên. Dî vi tewrê Tirkiyê da çend sedem rol dileyizin. Sedemek ew e ku Kurdên Iraqê, ji bo Tirkiyê problemeke siyasî ne. Çimki problema Tirkiyê bî xwe heye bî Kurdên xwe ra, ku mafên xwe dixwazin. Paşê, Kurdên Iraqê ew kes in ku mêjda biryar dane ku ji bo mafên xwe çek bigirin destê xwe û şer bikin. Û Tirkiye muamela hêsiyê herbê bî wan ra dike. Sedemeki din jî, ku Tirkiye rê nade MY, ew e ku di destpêkê da li xwe nehatin mukurê weki ew bî imkanên xwe yê aborî nîkarin jî bin pîrsê derkevin. Lê piştî çend mehan mecbûr man ku herin derva û alikariyê bixwazin. Alikariyê dixwazin, lê ne wek alikariya material, pera dixwazin. Lê ne Swêd, ne*

ji welateki din li Rojavayê pera bide Tirkiyê, bêyî ku bîzanibe û bikaribe kontrol bike ka ew alikari digihîje ciyê xwe yan na.

Lî gor baweriya min ew mecbûr in rê ji UNHCR'ê ra vekin, ku em Swêd û welatên din ên Rojavayê bikaribin di çareserkirina vê pîrsê da bîbin alîkar.

ROJA NÛ: *Tu û hevalên te yê parlamentê, hûn dê çî bikin derheqê vê pîrsê da?*

MARÏA LEÏSNER: *Piştî ku em ji Tirkiyê vegeyriyan, min li ser vê gerê û ditmên xwe bî frehi bî memûrên Wezareta Derva ra qise kir. Çend roj berî niha ez digel hin endamên wê komîta nûavakirî (Komîta Pîştgiriya ji bo mafên insanê yê Kurdan) me ji Wezareta Derva daxwaz kir ku, rapora me pênc kesên parlamentê ku çûne Tirkiyê, li ber çavan bigirin. Ango, wek gava pêşin Wezareta Derva li ser vê pîrsê hatiye agahdarkirin.*

Ya duwemin, min çend pîrsiyar ji hukûmetê kir li ser rewşa penaberên Kurd: Gelo hukûmeta Swêd amade ye ku alikariya aborî bide? Gelo hukûmet amade ye ku hewl bide bona ku rê li rêxistinên humaniter bête vekirin? Gelo Swêd amade ye ku hin penaberên Kurd qebûl bike? Swêd insiyatifê digre ji bo ku Tir-

kiyê bête iknakirin, da ku UNHCR here nav wan kampên? Lî gor baweriya min penaberên Kurd geleki tîn êşandin, ew di rewşeke pîr xirab da ne. Bes e, diwê rojeki zûtir çare bête ditin, dawîya vê rewşa xirab bê.

ROJA NÛ: *Lî ser mafên mîrovî yê li Tirkiyê û li Kurdîstana Tirkiyê, ditina te çî ye? Mîrov dikare bêje ku êdî li Tirkiyê êşkence nayê kirin? Azadiya fikrê û çapemeniyê heye? Tu bî xwe bûyî şahidê tu sûcan li diji mafên mîrovî?*

MARÏA LEÏSNER: *Ez bî xwe nebûm şahidê tu sûceki li diji mafên mîrovî. Lê min bî gelek kesan ra qise kir yê ku bûyer hatine serê wan bî xwe. Pîr mixabin ku zemanê me pîr kurt bû, me ew firsend nebû ku em bikaribin li ser vê meselê lêkolîneke fireh bikin. Lê di vi zemanê pîr kurt da, dişa ji gelek tişt ji me va baştir eyan bûn. Bî rastî ez şaş û metal mam, ku min qet texmîn nedikir ku rêyeke ewqas dirêj heye li pêşiya Tirkiyê, heta ku bigihîje demokrasiyê.*

Qasî ku em têgihîştin, êşkence û zordestî her wek berê dom dike. Çend rojên piştî çûyina me ya wir, avûkatek hatibû girtin û êşkenekirin. Azadiya çapemenî ji tune, me ji gelek rojnamevanan bîhist. Qedexê û sansur her tim heye. Rojname û kovar di bin zordestiyê mezûn da nîn. Bî taybetî azadiya fikrê, li ser pîrsa Kurdan temamen tê pêpêskirin. Tewrê li diji wan parlamentêrên sosyaldemokrat yê ku li ser pîrsa Kurdan fikrê xwe gotibûn, delîleki berbîçav e. Û gelek delîl û îsbat didin xuyan ku Tirkiye ji demokrasiyê geleki dûr e.

ROJA NÛ: *Dema ku tu li wir bûyî, gundi-yên Yeşilyurtê bî êşkence û kirinên nîzimxistinê dihatin zêrandin. Vê bûyerê da çapemeniya Tirkiyê û cihanê da deng da.*

Tu dikari bibêji gelo derbarî vê bûyerê da te çî bîhist û tu çî dizani?

MARÏA LEÏSNER: *Berî ku em herne wir me li ser vê bûyerê xwendibû. Lê me li Diyarbekirê bî "Komela Parastina Mafên Mîrovî" ra û bî avûkatên gundiyan ra qise kir û wan ji me ra behs kir ku ew hovîtî çawa qewimiye. Me li Diyarbekirê wali ji dit û wi ji me ra got ku, niha lêkolîneke nû çêdibe derheqê vê bûyerê da, "eger ew kesana bî rastî sûcdar bin, hingê wê ji işê xwe bî avêtin." Tiştê baş bû ku wali yekser înkâr nekir û hewl neda ku di ser pîrsê ra bî hêsanî derbasbe. Ez hevidar im ku lêkolîneke ciddî çê bibe ku careke din rezaletêke weha çê nebe.*

Diwê ez bêjim, wexta me ew tişt bîhist, em hemû şaş û metal man. Ma êdî ji vi metodî ji xirabî heye ji bo nîzim û piçûkxistin û êşkencekirina insanê?.. Ango ew çawa dikarin tiştêke weha bikin, hişê mîrov nagre.

ROJA NÛ: *Gelek spas ji bo bersivên te.*

BILA HELEPÇE NEYÊ JI BÏRKIRIN!

Dî salgeriya qetliama Helepçê da, lî gelek welatan cîvin, meş û daxuyaniyên biranin û protestoyê çêbûn. Lê Swêdê jî, dî vi wari da gelek xebatên girîng pêkhatin. Bî pêşangeh, miting û cîvînan qetliama Helepçê û bî karanina çekên kimyayî lî diji gelê Kurd bî xurtî hat protestokirin.

KAMPANYA KOMKAR-Swêd PÊŞANGEHA FOTOGRAFAN, FÎLM Û DÎAS

Lî Stockholmê, Komela Karkerên Kurdistan (KOMKAR-Swêd) jî bo biranin û protestokirina qetliama Helepçê û şerê çekên kimyayî lî diji gelê me yê Kurdistanê Iraqê, bî qasî mehekî (jî 24'ê Sibatê heta 28'ê Adarê) kampanyeke fireh meşand.

KOMKAR-Swêd'ê dî Seraya Kulturê (Kulturhuset) da (ku lî navenda Stockholmê dikeve) lî ser Helepçê pêşangehek vekir. Dî vê pêşangehê da fotograf, fîlm û dîas hat nişandan. Lî Stockholmê, Uppsalayê û çend bajarên din bî sedan afîş lî diwaran hatin zeliqandin. Lî ser Kurdistanê, jenosîda Helepçê û penaberên Kurd lî Kurdistanê Tirkîyê broşûreke agahdarîyê sê caran hat çapkirin û bî qasî 5000 jî wan hatin belavkirin.

Lî gor agahdarîya serwerên Seraya Kulturê nêzîkî 100000 kes lî vê temaşegêhê geriyane û ditine. Dîsan bî amadekarîya KOMKAR-Swêdê, dî 15'ê meha Adarê da lî ser jenosîda Helepçê cîwînek hat çêkirin. Serok

û berpirsiyarên rêxistinên humanîst, hin parlamenterên Swêdî, berpirsiyarê Komîta Helepçê û nûner û dilxwazên rêxistinên Kurdistanî, dî cîwînê da beşdar bûn û lî ser qetliamê û encamên wê; lî ser rewşa penaberên Kurd yê lî Kurdistanê Tirkîyê ditinên xwe gotin. Serokê Rêxistina Rîzgari û Alikariya Zarokan (Râdda Barren) Thomas Hammarberg (se-

GAS ÖVER HALABJA




HALABJA, DEN STAD I IRAKISKA KURDISTAN,
DEN 1 MARS 1988 BLEV OFFER FOR IRANS
KEMISKA KRIGÖRING

24 FEB - 28 MAR

KULTURHUSET

ARR. SVENSK-KURDISKA ARBETARFÖRENINGEN (KOMKAR-Swêd)

rokê AMNESTY'ê kevn), berpirsiyarê Xaçê Sor Sten Furbo, rojnamevanê Swêdî ê ku piştî qetliamê çûbû Helepçê û gelek sûret gîdîbûn, S.Hjärten, parlamenterên ku dî nav heyeta Komîta piştgiriye jî bo mafên Kurdan yênsani da çûbûn Tirkîyê û lî kampan geriyabûn wek Maria Leisner û Ragnild Pohanka, ditin û intibayên xwe lî ser rewşê anin zîman. Gîş ser pêwîstî û hewcedariya alikariyê



Lî ser qetliama Helepçê, mehekî fîlm, fotograf û dîas hatin nişandan.

ji gelê Kurd ra hemfikir bûn.
Wan dan kîşê ku wê ji bo alî-
kariya gelê Kurd bixebitin.

MÎTINGEKE MEZIN

Dî 16'ê Adarê da jî, bi insiyatîva "Komîta Pîştgriyê Jî bo Mafên Kurdan Yênsani" mitîngeke protestoyê hat amadekirin. Bi hezaran Kurd û Swêdî beşdarî mitîngê bûn. Dî vê mitînga biranînê da Wezîrê Swêdê yê Derva Sten Andersson, serokê Sendîka Karkerên Metalê Leif Blomberg (herweha serokê vê Komîta Pîştgriyê ye), artistê swêdî ê bi nav û deng Gosta Ekman beşdar bûn.



Berpirsiyarên rêxistinên humanîter di gel beşdarên civînê ên din li filma "Bayê mîrînê" dînihêrin.



Serokê komîtê
Leif Blomberg

Wezîrê Swêdê yê Derva S. Andersson jî gotarek xwend. Andersson di axaftina xwe da weha destpê kir:

"Ew resmên Helepçê yênsani bi dehşet heta ketin odayên me yênsani rûniştandinê jî. Em wan resman tu wextê jî bir nakin. Dî wan resman da zarokên kuştî minî ku ketibin xewê xuya dikirin. Lê wehşeta şerê gazê li wan qewimî bû". Dûra wezîr ev qetliam şofande Getoya Varşovayê, û keçîka Vietnamiya ku jî ber bombeyên napalmê agir bi pîştî wê ketibû û di-reviya. Wi herweha got ku ne



Foto: LENNART ISAKSSON
Den nybildade "Svenska kommittén för kurdernas mänskliga rättigheter" arrangerade ett solidaritetsmöte i Stockholm på onsdagskvällen, ettårsdagen av giftgasmassakern på kurder i den irakiska byn Halabja.

tenê li Iraqê, li hemû parçên Kurdistanê gelê Kurd dî bin zordestiyê da ye.

Wi got ku jî ber van sedeman Swêd wê hembêza xwe veke jî bo penaberên Kurd, û hazir e ku alikariyê bîşîne jî bo penaberên ku li Tûrkiyê û Îranê hewceyî alikariyê ne.

Paşê avukat û parlamenter Hans Görän Frank (Sosyal De-

mokrat) û Maria Leisner (Partiya Gel) jî dî vi wari da qise kirin. Maria Leisner bi bangêki jî hukumetê daxwaz kir ku alikariyê bide 35000 Kurdên penaber yênsani li Tûrkiyê.

Dî vê mitîngê da KOM-KAR-Swêd jî aktiv beşdar bû.

Vê mitîngê dî çapemeniya Swêdê da bi awaki fireh cih girt.

Lı ser otoriteya dê û bavan

Werger: DILSOZ

ANTON MAKARENKO

Me çend otoriteyên şaş dani pêş çavan. Mırov dıkare gelek nımûneyên dın ji bide. Wek nımûne, em, dıkarın "Otoriteya Rûken", "Otoriteya Zanısti, "Otoriteya Zarokên Baş", "Otoriteya Xweşıkbûnê" ji nişan bıdın. Em, piri caran dıbinın ku dê û bav lı ser cûreyeki otoritê nafıkrın: Çawa lê hat wısa dıjin, çawa lê hat wısa wezifên xwe bı cih tının, ji bo perwerdekırına zarokan tıştên heri baş ên ku ji destê wan tê dıkn. Kesên ku bı vi hawê ne, iro tewreki hışk nişan dıdın, ji bo kêçê nivinê dışewıtının, dotıra rojê hezkırnek dagırti nişan dıdın, rojeki dın ji ji bo xweşkırina dilê kesên hember xwe hın sozan dıdın. Pıstre dısa ceza dıkn, lı dû ji dılgermiya xwe ye berê nişan dıdın. Dê û bavên weha wek şeytan ın. Bêmecal ın, nızanın çı dıkn. Dı derheqa otoritê da carna dı navbera dê û bav da nakoki dertê. Dı rewşên weha da dıvê zarok, hini tewrên diplomati û rêyên çıvdani bıbın dı navbera dê û bavan da. Carna ji, dê û bav guh nadın zarokan û lı ser wan nasekının, armanca wan tenê pêşıgirtına nerhetya zarokan e.

Dı malbateke Soveyeti da dê û bav,
wê otoriteyêke çawa saz bıkn

Bıngeha otoriteya dê û bav a esehi grêdayi jıyan û xebata wan, tewr û hereketê wan û wek hemwelati şexsiyeta wan e. Malbat, saziyek gıring e û bı gelek berpırsiyariyan dıxwaze. Lı hember cıvatê berpırsiyarê jıyan û bextewariya zarokan ın. Eger dê û bav bı awaki tekûz û bı mantiq rêvebırıya saziyê (malê, malbatê) bıkn, armancên baş û berbı pêş ji xwe ra kırıbın prensib, haya wan ji tewrên wan hebe û dı wê zaninê da bıkn, bıcihbûna otoriteya bav da zehmetiyek nayê kışandın.

Mecbûri lêgerina hun rêyên çekiri (sûni) nabın.

Gava zarok mezin dıbin, dıxwazın hın bıbın ka rewşa dê û bavê wan ê cıvaki çawa ya û lı kuderê dıxebıtın. Dıxwazın hanhanka hın bıbın ka dê û bav jıyana xwe bı çı dıdomının, bala xwe dıdın ser çı, der û dora wan çawa ye. Gelek gıring e ku zarok, meslegê dê û bavên xwe kareki ciddı û gıranbuha bıbının. Dıvê zireki û jêhatibûna dê û bavan lı gor nêrina cıvatê zirekiyên heri pêş, xwedi buhayek bıngehin, ji fors û fıyaqê dır bê xuyan (ji zarokan ra). Dıvê zarok, vê qımetdayinê têbıgıhıjın. Dıvê ev ji, bıngeha pêşketına welatê me pêk bine. Gere ev kesên han mesela qımetdayinê nekın babeta xırûrê. Dıvê bı xırûra jıyana Yekitiya Sovyet bıjin. Dıvê zarok tenê bı dê û bavê xwe nepesının. Gere navê kesên pêşevanên welatê me bızanıbın. Dê û bavên xwe wek parçeyeki cıvatê bıbının.

Dıvê mırov ji bir neke ku insan xwedi hın mıjüliyan ın, hun astengi lı pêşıya wan hene û xwedi şerefeki ne. Dıvê dê û bav, bı tu awayi lı hember zarokên xwe wek insanên mezin (ji xelkê payebilındır) neyên xuyan. Gere zarok têbıgıhıjın ku insanên dın û dı vê navberê da hevalên dê û bavê wan ji xwedi hın merifet û xısûsiyetan ın. Eger bıngeha otoriteya dê û bav a hevdem, bı tıştan dereng nehıse yan ji herkesi bıçûk (nızım) nebıne û otoriteyeki cıvaki be, dı rastiyê da wê gavê xısûsiyeta gıranbuhayi dıstine. Eger mırov bı viya dılşa be tê wê manê ku perwerdegariyeki baş hatiye dayın. Lê dıvê dê û bav, dı cıvata xwe da ne dı rewşeki nızım da bıkn. Jıyana me parçeyeki cıvata sosyalizmê ye. Dıvê dê û bav, xwe ji zarokên xwe ra, bı tewr û hereketên xwe, ispat bıkn ku ew parçeyeki cıvateki weha ne. Dıvê bûye-

rên ku di jiyana navnetewî da dertên holê, afirandinên edebî yê giranbûha xwe di jiyana dê û bav, his û daxwazên wan da nişan bîdî. Tenê ev dê û bavên han —hemwelatîyên me yê esehî yê ku di jiyaneke têr û tije da ne— li ser zarokan otorîteyek rast datînin. Ji kere-ma xwe ra, ji bo ku zarok kîş bîkî, ji bo ku hûn bî merîfetên xwe li ser wan tesîr çêkî divê hûn bî domandîna pêwîstiya jiyaneke weha bewirî neyîn. Mîrov xwe dîxapîne. Divê hûn bî rastî û bî dil û can vê jiyaneke bijîn, lê divê hûn li hember zarokan nekevin rewşeke xweşikandane. Binfireh bîn. Ew (zarok) di nava demê kurt da ji ber xwe va têdîgihîjî ku wê çî bîkî.

Hûn ne tenê hemwelatî ne. Di eynî wextê da bav in. Divê hûn wezîfeyên bavîtiyê bî awakî baştirîn bî cih binîn. Li vê derê bîngeha otorîte xwe dispêrê, tê pêş çavan. Û berya her tîştî divê hûn zanîbî ku, zarok çawa diji, bala xwe dîde ser çî û ev bal bî kîjan alî va pêşdikeve, ji çî hezdikeye ji çî heznake, çî dîxwaze çî naxwaze. Divê hûn hevalên wî (zarok) nasbîkî, bî kî ra kîjan listîk dîleyîze, çawa dîxwîne û çawa têdîgîhîje bîzanîbî. Eger zarokê we here dîbîstanê divê hûn tesbît bîkî ka di dersxanê da li hember mamosta û dîbîstanê tewrê çî ye, astengiyên çawa dertên pêşîya wî. Divê ev hemû tîştên han ji biçûkîyî zarokê bête taqîbkîrîn. Dêlva ku mîrov bî hûn nakokîyên bêwext bîhîse, divê mîrov wana ji mêjva his bîke yan ji texmîn bîke.

Divê vana bête zanîn. Evya nayê wê manê ku zarok bî pîrsên bêdawî tê acîzkîrîn. Gere hûn nekevin rewşa casûsê ku mîrovan biçûk dîxîne û acîz dîke. Divê ji destpêkê zarok serpêhatîyên xwe, bîxwe bîbêjîn. Divê daxwazîyeke weha his bîkî. Gere ew bîxwe, bî xebatên we mujûl bîbî. Gere hûn, hevalê zarokên xwe binîn malê. Hûn tîştan ji wan ra îkram bîkî. Hûn dîkarî herî mêvandariya malbatên wan ji, û divê rojî zûtîr hûn hevdu nas bîkî. Ev karên han zêde wext nagîrîn. Eger hûn li gor pêwîstîyê guh bîdî zarok û jiyana wan, bes e.

Eger hûn tevî jiyana zarokan bûbî û li gor pêwîstîyê we bala xwe dabe ser wan, zarok ji bî vîya dîhîsî û têderdîxî. Dema ku ew, bî pêşeroja dê û bavî mujûl dîbî pê kêfxweş dîbî û ji ber vê yekê ji rûmet nişan dîdî. otorîteya ku xwe dispêrê zanîne, alîkariyê hêsantîr dîke. Her zarok di jiyana xwe da rastî gelek bûyeran dîbe, lê gelek ji wan nîzanî ku

wê çî tewr nişan bîdî. İhtîyacıya wan bî alîkari û rêberîyê heye. Belkî vê alîkariyê ji we nexwaze ji. Lewra rîya xwestîne nîzane. Divê hûn ji ber xwe va alîkariya pêwîst bîkî.

Ev alîkari pîrî caran rasterast bî şîret, jest, rênişandane û carna ji bî şîklê ferman dîkare bête kîrîn. Eger we ji nêz va çavînerîya jiyana zarokê xwe kîrîbe, bêyî ku hûn kesên dîn têkîlî vî îşî bîbî, hûnê bîzanîbî ku mîrov çawa hereket dîke. Gere alîkari pîrî caran bî awakî taybetî yan ji xîsî bête kîrîn. Carna mîrov beşdarî listîka zarok dîbe, hevalên wî nas dîke, li dîbîstanê ji bî mamostê wî ra dîde û dîstîne. Eger ji yekî zêdetîr zarokên we hebî, tê wî manê ku îşê we gelek hêsantîr bûye. Bra û xwîşkên mezin ji bo vê babetê û çarelêkîrîne dîkarî alîkariya we bîkî.

Dem a ku dê û bav alîkariya zarokan dîkî, gere nekevin tewreke acîzkîrîne. Di hûn rewşan da divê zarok bîxwe ji heqê kar derê. Gere pîrsîrêkên tevîhev ji çareser bîke. Gere disa ji, ji nêz va çavînerîya wan bête kîrîn. Gere rê neyê dayîn ku bîkevin bêhêvîbûne û şaşmayîne. Divê zarok pê bîhîse ku ew tê parastî, bî qeweta wî tê bawerkîrîn.

Otorîteya ku xwe dispêrê alîkariyê ya ku bal û hesasîyet dîxwaze û otorîteya ku xwe dispêrê zanîne bî hevra enîyek pêktînin. Wê zarok his bîke ku hûn li ba wî ne û wî kontrol dîkî, lê wê bîzanîbe ku eynî wextê da hûn ji bo wî her tîştî nakî. Wê gavê wê nîkarîbe ji berpîrsîyariyan bîreve.

Berpîrsîyari, ji beşa otorîteya dê û bav a duwem û gîrîng pêktê. Rewş çî dîbe bîla bîbe divê zarok, di tu wextî da, bîrêvebîrîna malbatê û şexsê xwe wek têrbûn yan ji listîk şîrove-neke. Divê zarok têbîgîhîje ku, hûn ne tenê ji bo xwe di eynî wextê da ji bo wan ji, li pêşberî civata Sovyetê xwedî berpîrsîyariyê ne. Gere ji kur û qîzên we ra, yê ku we bî dil û can û bî bir û bawerî gîhandîye, bî awakî vekîrî bête gotî û bîzanîbî —ku tu xetereke wê tune— ku gelek tîştên hînbûne henîn, gere bîbî hemwelatîyeki baş û serfîraz, gere berpîrsîyariya serfîraziyê ragîrî û ji vê berpîrsîyariyê nerevin. Berpîrsîyari, ji alîkariyê wêda, daxwazîyeki bî rîk pêwîst dîke. Di hûn rewşan da divê ev daxwazî bî awakî hîşk bê meydanê. Gere tu mazeret neyê qebûlkîrîn. Ji keynî vîya, eger zarok xwedî zanîna berpîrsîyariyê be daxwazî nişanên xwe dîde xuyan. Gere zarok bîzanîbe ku, ew û dê û bavê wî li geraveki tenha najîn.



ZAROK

Rovi û Gur

Wxetekê rovi ji gur ditirsîya. Rovi rokê fikiri, got, "Ez çawa feneki binim serê gur". Çû cem gur got:

- Were em bîbîm birayê hev.
- Ê... got, tu bîbî birayê min, tuê kêri min û çî bêyi?

Rovi got: — Çawa ezê kêri te bî çî bême? got, çîqa rispiyê gundan in, destûrnameyek dane min. Ez herim kijan gundi, kûçîk nayêne min, got, ezê te bîbîm ber gunda, hemî kaxezê min heye, kûçîk nayên min, tu ji ji kêleka gund pezekê ji xwe ra biravine bine.

Gur fikiri, got:

- Welleh, eva pak e. Ê, got, tu birayê minî mezîni, weki usan e.

Çend roj bî hevra geriyan. Rojekê rovi zanîbû, kûçîkên kijan gundi zef in, pêşya gur ket got:

- Emê herî kêleka gundê han, çîka çîka em tîşteki nayîm.

Çûne kêleka gund. Gundiya dit gurek û roviyek lî kêleka gund in. Gundiya gazi kûçîkan kîr û kûçîk berdanê. Ev herdu revî. Hevrazek kete ber wan, gur gazi kîr got: — Bîra kaxez derxe!

Ê, rovi lî pêşiyê ye. Rovi wê kaxez ji ku bine. Rovi êdî çû, gur lî hîviya kûçîkan hişt.

Bî çî haleki gur ji kûçîka xilas bû.

Gur got: " Bîra adbe, rovi tu ji destê min xilas nabî." sekîni sîbetîrê, gur ciyê rovi zanîbû û ber bî mala rovi çû.

Rovi lê nihêri gur tê, fikiri û got: "Min gur xapandiye, gur wê icar min bîxwe." Rovi ji xwe ra rê dit, pêşya gurda çû.

Gur gazi kîr, got:

- Bîrê rovi, got, te nedîgot ezê te bîbîm ser belayeki?

Rovi got:

- Çîma bîra, ez kor bûme?

Gur got:

- Ne te got, kaxezê min heye.
- Ê, got, bîra çîma kaxezê min tune?

Gur got:

- Lê te çîma nexwend?

Rovi got:

— Mala te xîrab be. Minê wê sehetê katîbê xwe ji ku bîniya, weki ew hevrazê ku ket ber me û seyê sori qol dabû ser me, heta katîb kaxez bîbîxwenda, ewê te ji bîxwara, min ji, lema min dernexîst.

Gur got:

- Rast e ez qurbana birayê xwe bîm, birayê minî bî aql e.



Gur, Deve û Rovi

Wextekê gur, rovi û deve bûne hevalê
hev Gur gote rovi:

" Em menikê li devê bigirîn
Belki em devê dikujîn,
Goştê wê bixun
Hestiyê wê bimijîn,
Poça xwe hildin bimeşîn."

Rovi gote devê:

– Bira were em gunê xwe bêjîn. Gu-
nê kê zef be, bira xwe zînêr da bavêje.
Gur got:

– Xebera birê min i rovi ye.

Gur got rovi:

– Bira tu bêje, çika te çi kiryê?

Rovi got:

– Hingî min nêçir kiryê, mişkê ber
mîrar, min nexwariye.

Gur gote rovi:

" Bira min xwariye pezê bê mîrar e,
Rêtiye çavê xêrnexwaz
Lema jî navê roviyê bira derketiye
dekbaz."

Rovi disa got:

" Ez rovi me fêlbaz
Birê te me !
poçka min dirêj e mina saz
Ez digêrîm serfînyaz."

Gur gote devê:

– Bira dora te ye! Tu bêje, çika te çi
kiryê?


Devê got:

"Ez devenga belengaz
Belki xirab be
mala rovi û gurê xêrnexwaz
Ez zanîm, hûnê min bixun,
Werî striyek ketiye ber dranê min,
Belki hûn jê derxîn,
Paşê ez ê xwe zînêr da bavêjim."

Rovi û gur bî hevra niqê xwe kirîne
ber dranê devê. Nişkêva devê dranê
xwe da ser hev. Devê got:

"Roviyo, bî feno, fînyazo,
Tu feqîro, belengazo"
Devê, rovi û gur hevra avitîn,
Teyr nişkêva berbî wan hatîn,
Pirtiyê rovi jî zînêr nedihatîn,
Serê gur hişk e,
Dranê wan tê da, dervediketîn."

*Ev çirokên han jî pirtûka "Folklorê Kur-
mancî" Yêrevan 1936, ya H. Cîndî û E. Evdal
hatine wergirtin.*



Jİ FOLKLORA MÊ

S
T
R
A
N
E
K
E

G
E
L

Esmer heyran xaniyê mala bavê Esmera hê, hê, hê, hê, hê
mî jî gund tek e,
Geli gundi cinarno Esmera mî yeka bejinzîrav e,
Çav bî kîl e, bîsk bî têl e, çepîldîrêj e, porkej e,
nav qendîl e hê hê hê hê hê çavbelek e,
Ez bî qurban vê sîbengê, Xwedê jî fesad û şeytanên
gundê me ra qe hîlmede reben ez îm hê hê.... qebûl meke,
Çawa nehiştî Esmera delal qasekê lî kêleka mî rûnê,
Bî mî ra têr mîjûl be gundo hê hê hê... têr qiseke
Bê Esmer hê hê hê hê... Esmer horî
Keçîka taxa jorîn xwezîla tu bûka mala bavê mî biya yî
Jî mî ra bîbûyayî bermaliya mala teze, ezê bîbûma malxê
Mînê bigota bermaliya teze ez bî qurban hê hê... ez bî gori.

ESMER

Berevkar: SÎPAN

Esmer heyran xaniyê mala bavê
Esmera hê hê hê hê mî jî gund der e
Geli gundi û cinarno hûn dêna xwe
bîdîne Esmer yeka bejinzîrav e,
çav bî kîl e, bîsk bî têl e, çepîl dirêj e,
porkej e, nav qendîl e hê hê... rengesmer e,
Geli gundi cinarno dîkîm herîm
dîtîna Esmera delal vê sîbengê
Ne tu cî ye ne tu war e gundo hê hê ... ne çeper e
Ez û Esmera delal qasekê rûnêne
lî tenîştê hê hê ... car lî ber e
Herçî kesê şûşa orta herdu dîla,
her çar çavan bîşikêne, belkî
salê carek afatek hê hê ... serda were,
Geli gundi cinarno hûnê pîrsa Esmera
delal jî mî dîkîm, Esmer yeka
Bejinzîrav e, çav bî kîl e, bîsk bî têl e,
bejinzîrav e xalîq rebî heywax lî mî
Hê hê hê hê... gerdîzîr e
Esmer hê Esmer horî
Bê keçîka taxa jorîn xwezîla tu bûka mala bavê mî bûyayî
Jî mî ra bîbûyayî bermaliya teze, ez jî te ra bîbûma malxê
Hê hê hê hê ... ez bî gori....

LI TIRKIYÊ ZORDESTIYA SER WEŞANAN

Lî Tirkîyê dî van mehên dawi da zordestiya lî ser pressê bilind bû. Roj tune ku, polêz dî ser kovar û rojnameyan da negire, ew neyên komkîrîn, berpirsiyar û xwediyên wan neyên girtin û zulm û teda nebinin.

Şewitandin û jî ortê rakirina kitêban iro jî berdeyam e.

Mehkemeke Tirk, dî derheqa kitêba niviskarê bî nav û deng Henry Miller bî navê Oğlak Dönencesi da bîryar da ku bê komkîrîn û jî ortê rakirin. Gor mehkemê, kitêba Miller bê edeb bûye. Çend roj berê, mehkema herî bilind (Yargıtayê) ev bîryar testi qır! Dî derheqa romaneke Tırki (Sudaki İz, ya Ahmet Altan) da jî disa bîryareke usa hat dayin.

Wezirê Dadi eşkere kîr ku, ew kitêb û rojnamên han naşewitinin, lê dîşî-nî karxana kaxîza, lî wir dîkî hevir! Ev yek jî êdî çî nişan dîde: hemçaxiya wan ê dadi, yan jî hostatiya usa hat dayin?.

Rojnama Cumhuriyet (ya 25'ê Sibatê) eşkere dîke ku dî pênc sal û nivê dawi da:

- * 458 weşan hatiye komkîrîn;
- * Derheqa 368 weşanan da bîryara jî ortê rakirînê hatiye dayin;
- * 39 ton weşan hatiye şewitandin;
- * 40 ton jî lî benda şewitandinê ye;
- * Mehkeman du hezar sal cezayê hepskirînê, her usa jî, bî milyaran cezayê pere dane niviskaran, wergeran û xwediyê weşanxanan;
- * Berpirsiyarên 26 rojnameyan iro jî dî hepsê da ne.

Ev yek, tiştê ku tenê dî dema Hukûmeta Ozal da (ango dî dema "derbasbûna demokratîyê" da) bûye, ev e. Tiştê ku dî dema Cuntayê da bû, bê hed û hesab e û lî der e.

Ev yek baş nişan dîde ku lî Tirkîyê, dî warê çapgeriyê da jî rewşa xîrab ne guhuriye. Têrora dewletê lî ser pressê iro jî bî xurtî berdeyam e. Ev teror, xasîma lî ser kovar, rojname û kitêbên ku behsa pîrsa Kurdî dîkî, rexne lî kîryarên hukûmetê dîgîrîn, lî ser wan bilind e. Weşanek, an niviskarek ku bî awayekî pozîtîf behsa Kurdan bîke, nîkare pêsîra xwê jî zulma dewletê xîlas bîke.

Kovara Özgür Gelecek yek jî wan e. Ev kovara mehi dî Çileyê Pêşîn, sala 1988 dest pê kîr û heya nîha 3 hejmar derket. Lê hersê hejmarên wê jî hatin komkîrîn. Polêz hin dî çapxanê da dest da ser hejmara sîsêyan. Berpirsiyar û xwedî hatin girtin. Jî ber ku dî kovarê da behsa heqên mîrovî û behsa pîrsa Kurdan dîbû. Xwediyê kovarê Mehmet Bayrak (niviskarekî bî nav û deng e) nameyêke hozanê Tirk yê bî nav û deng, Nazım Hikmet, dî kovarê da neşîr kîrîbû ku tê da dîhat gotin: "gelên Kurd û Tirk bîra ne". Sebebê girtina Mehmet Bayrak ev e!.

Lê bî wê jî nema. Dî 2'yê Adarê da cendîrme avête ser mapîsxana Enqerê, bî mana "lêgerînê" lî girtîyan zulm û teda kîr. Mehmet Bayrak jî dî nav da bû. Leşker û polêzên xasîma lîxîstînan ku dî kovara xwe da lî ser Kurdan dîmîvîse. Destnîvisên wî, kitêbên wî jî dest girtin, berçavîk şîkandin û lîdan, bîrîndar kîrîn.

Bona vê yekê, girtiyên mapîsxana Enqerê dest bî girêva bîrçîtiyê kîrîn.

Em zordestiyên hukûmeta Tirk lî ser pressê û lî ser girtiyên sîyasi protesto dîkî. Jî hemû kes û rêxîstînen demokratîk, jî pressê dîxwazînan ku dijî vê zordestiyê bî xurtî derkevînan, pîştgîriya niviskar û çapgerên zulmdîtî bîkî. Pîştgîriya gel û bîrewerên Kurd û Tirk bîkî ku ew bo demokratî û azadîyê şer dîkî.

Bese zordestiya dewleta Tirk lî ser niviskar û weşanan!

Jî girtiyên sîyasi ra azadî!

Jî kitêban ra, kovaran ra, bîr û bawerî ra azadî! WEŞANXANA ROJA NÛ – Swêd

4. 3. 1989



Foto: LARS BOSTRÖM

Şınvarê biçûk, 8 salî,
hovîtiya rejîma faşîst
a Îraqê bî vî resmê
han aniye zîman.

